# Meşa azadiyê dest pê dike

**PÊŞEROJA KURDAN OCALAN E**

Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Fransayê (CDK-F) ji bo meşên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, banga tevlîbûnê li hemû kurdistaniyên li Ewropayê kir. CDK-F'ê xwest ku ji her demê zêdetir kurdistanî ji bo pêşeroja xwe li Ocalan xwedî derkevin..



**ÎRO LI ALMANYAYÊ MEŞ HEYE**

NAV-DEM'ê ji bo meş û mîtîngên ku îro li gelemperiya Almanyayê bi dirûşma "Ji Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re statu" bên lidarxistin, banga tevlîbûnê kir. Parlamentera HDP'ê ya Rihayê Dîlek Ocalan di civîna TJK-Rûsyayê de got ku tecrîd encax bi çalakiyan were şikandin ... R - 7

ROJEVA **Medya**

28 Çile Şemî 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 79

HEYETA KURD JI RÛSAN RE GOT

# Federasyon nebe nabe

Piştî civîna PYD û Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê hate zanîn ku kurdan ji bo pêşeroja Sûriyeyê destnîşan kiriye ku bêyî qebûlkirina federaliyê çareserî ne pêkan e. Rûs bi erênî nêzî pêşniyarê bûne... RÛPEL - 4



## Divê kurd jî li Cenevreyê bin

Berdevka Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê Mariya Zaxarova destnîşan kir ku Rûsya dixwaze ku kurd tev li civîna Cenevreyê bibin. "... R - 4

# Esnaf jî dibêjin NA

Her çi qas AKP dixwaze bi bin siya OHAL'ê de bi dek û dolaban, bi gur û gefan di referandûmê de bi ser bikeve jî eniya 'na'yê her ku diçe mezintir dibe. Ji esnafan heta jin û ciwanan, ji sporvanan heta hunermendan dengê 'na' bilind dibe




**SÎLEYA XURT; NA**

Wisa xuya ye ku bloka AKP/MHP'ê ya serokdewletiyê di referandûmê de dê sîleyeke xurt ji hemû derdorên civakê bixwe. Jin, ciwan, siyaseta demokratîk, esnaf, hunermend û sporvan dibêjin 'na'

**RENGÊ DENGÊ ESNAFAN**

Li dijî referandûma ku ji bo guhertinên makeqanûnê hatiye destpêkirin aliyên ku dibêjin 'na' zêde dibin. Di referandûmê de ku dê di bin siya OHAL'ê de pêk were, esnafan got ku ew jî dê bibêjin 'na'

**DENGÊ NA BILIND DIBE**

Piştî ku sporvan û hunermendên alîgirên AKP'ê dengê xwe aşkera kir, sporvan û hunermendên xwedî wijdan û demokrat jî di ser medyaya civakî bi dîmenên ku diweşînin, dibêjin dê ji bo jiyaneke birûmet bibêjin 'na'...

**ROLA OCALAN GIRÎNG E**

Hevberdevka HDK'ê Gulistan Kiliç Koçyîgît got ku di referandûmê de dê ji bo serkeftina dengê 'na' şev û roja xwe bikin yek û bal kişand ser rola Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a di çareseriyê de...

**NEXŞERÊYA AMEDÊ**

Hevparên KCD, TJA, HDK, DBP û HDP ji bo ku nexşerêya referandûma guhertina makeqanûnê diyar bikin dê di 31'ê çileyê de li Amedê bên cem hev. Piştî civînê dê kampanya jî dest pê bike... → R2/7



FEHMA WAN A ÎSTÎHDAMÊ

## Çêkirina girtîgehan!

Hikumeta AKP'ê girtîgehên nû yên ku kapasîteya wan di navbera hezar û 500 û 5 hezarî de ye wek qadên îstîhdamê nîşan dide. Lê li aliyê din jî roj tune ye ku ji girtîgehan nûçe û agahiyên îşkence, zext û pêkutiyan neyên. Li gelek girtîgehên Tirkiyeyê li dijî binpêkirin û pêkutiyan grevên birçîbûnê dest pê kiriye... RÛPEL - 7



## Arîn û Avestayê serbest berdin

Jiyana ku daraza tirk ji bo zarok û dayikên kurd rewa dîbîne yan goristan an jî girtîgeh e. Vesîle Yuksel di 21'ê kanûnê de li Mêrdînê hat binçavkirin û bi zarokên xwe yên bi navê Arîn Mîrxan û Avesta re ket girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê. Zarok hefteyê 5 rojan li girtîgehê ne û du rojan jî li cem bavê xwe ne... R - 3

## Ceza li dayika aştiyê birîn

Li Êlihê, bi îdiaya beşdarî civînên Meclisa Bajar a Êlihê bûye, der barê dayika aştiyê Sultan Azboy (62) de bi îdiaya "Endamtiya rêxistinê" ji aliyê 2'yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Êlihê ve, 8 sal û 9 meh cezayê girtîgehê hat birîn... RÛPEL - 3

**Verra koletî omedê xeleşiyayişî... Meral Kuçuk** → R10

## Xweseriyê diyarî Rêberê xwe dikin

3'yemîn salvegera ragihandina rêveberiyên Xweseriya Demokratîk a Rojavayê Kurdistanê û 2'yemîn salvegera rizgarkirina Kobanê bi şahiyan tê pîrozkirin. Di şahiyan de xweserî û rizgarî diyarî Rêberê Gelê Kurd tên kirin... RÛPEL - 5



ARTÊŞA TIRK LI DÊRIK Û BABÊ SIVÎL KUŞTIN

## AKP têkçûnê hezim nake

**Dewleta tirk a di polîtîkaya Sûriyeyê de têk çûye li Dêrik û Babê komkujî pêk anîn. Artêşa dagirker li Dêrikê 2 û li Babê jî 10 sivîl qetil kirin**

Artêşa tirk a dagirker 2 sivîl li gundê Mezra yê nêzî sînorê Rojava û bakurê Kurdistanê qetil kirin û 5 kes jî birîndar kirin. Li aliyê din artêşa tirk li dijî gelê sivîl ê Babê komkujiyan pêk tîne.. RÛPEL - 5

www.rojavakurdi.org

## Lîstikvana îranî naçe merasîma xelatan

**LÎSTIKVANA ÎRANÎ** ya fîlmê ‘Firoşkar’ Taraneh Alîdostî ku di fîlmê derhêner Asgar Ferhadî de lîstiye, di gel ku fîlmê wan di Oscarê de fîlmê herî baş ê biyanî hatiye nîşandan jî lê belê ji ber biryara serokê Amerîkayê Donald Trump ya ku digot 7 welat nikarin bikevin Amerîkayê û yek ji wan jî Îran e, ji bo ku vê protesto bike biryar da ku neçe merasîma xelatdayînê. Taraneh Alîdostî (33) li ser hesabê xwe yê Twitterê biryara Donald Trump a qedexeya vîzeyê ji bo îraniyan wek netewperestî bi nav kir û wiha got: “Ev qedexe dixwaze çalakiyên çandî asteng bike, yan jî negire nav xwe, ji bo protestoyê ez beşdarî merasîma 2017’an nabim.” AMED - ŞÛJIN






## Xweserî bi vîna jinan bi ser ket

FÎDAN EBDULLAH / EFRÎN - ANHA

Şêwirmenda Rêveberiya Xweser a Kantona Efrînê Fehîma Silêman 3’yemîn salvegera ragihandina rêveberiya xweser a kantonê, li tevahiya gelên Rojava pîroz kir û da zanîn ku bi saya vê projeyê serkeftinên mezin hatin bidestxistin.



Fehîma da zanîn ku jin bi vîna xwe ya xurt beşdarî hemû sazî û rêxistinan rêveberiya xweser bûn û di qadên siyasî û leşkerî de cih girt û ji êrîşên dijmin re bûn bersiv û rêya azadiyê nîşanî jinan kir. Fehîma her wiha got ku ew rewşa jinên ku rastî zilm û şîdetê tên dişopînin û hewl didin wan biparêzin, li aliyekî din jî destnîşan kir ku rêveberiya xweser li herêmên Şahbayê û taxên Helebê yên rojhilat, bingeha birêxistinkirina hemû jinên Sûriyê ye. Şêwirmenda Rêveberiya Xweser a Kantona Efrînê Fehîma Silêman bang li jinên Sûriyeyê kir ku bi yek destî û bi awayekî aktîf çareseriyekê ji aloziya Sûriyeyê re peyda bikin.

# Serkeftin a jin û ‘NA’yê ye

**Parlamenterên HDP’ê Ayşe Acar Başaran û Bedîa Ozgokçe der barê referandûmê de axivîn û anî ziman ku dê bi paradîgmaya Rêberê Gelê Kurd kampanyaya “Ji dîktatoriyê re na” bimeşînin û dê jin bi ser bikevin**





Li Amedê, Tevgera Jinên Azad (TJA) bi deklarasyonekê starta kampanyaya “Ji Dîktatoriyê re na” da. Parlamenterên HDP’ê yên jin guherandina makeqanûnê nirxand.

Parlamentera HDP’ê ya Êlihê Ayşe Acar Başaran got ku xebatên referandûmê yên ku dê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad (TJA) bidin meşandin, dê bi navê “Em ê bi Rêberê xwe re teqez bi ser bikevin” bimeşînin. Başaran anî ziman ku dê jin bi paradîgmaya neteweya demokratîk tev bigerin û ev tişt anîn ziman: “Heke rejîma dîktator a faşîst were avakirin, dê destpêkê jinan û bi taybetî jî jinên kurd hedef bigire. Em destnîşan dikin ku alternatîfeke din a vê heye, ew jî pergaleke wisa ye ku her kes bi reng û dengê xwe tev bigere. Ji bo rûxandina rejîma dîktatoriyê divê em dengê ‘na’yê xurt bikin. Ji bo pêşeroja vî welatî, ji bo birêvebirina pergala heyî em ê bibêjin ‘na’.”

### AZADIYA OCALAN

Başaran destnîşan kir ku xwediyê paradîgmaya ku jinan esas digire, birêz Ocalan e û ev tişt anî ziman: “Ji ber vê yekê, kampanyaya ku em ê bidin meşandin jî, em dibînin bê ka azadiya birêz Ocalan çi qas girîng e. Em ê ne ji bo tecrîda li ser birêz Ocalan bê rakirin, em ê ji bo azadiya wî tê bikoşin. Ji ber vê, em ê berdewamiya kampanyaya xwe ya bi navê ‘Em ê bi Rêberê xwe re teqez bi ser bikevin’ bidin meşandin.

### DÊ BI RÊXISTIN BIKIN

Parlamentera HDP’ê ya Wanê Bedîa Ozgokçe jî destnîşan kir ku dê jin li her derê ‘na’yê bi rêxistin bikin û ev tişt ragihand: “Em ê bi hemû hêza xwe, da ku rejîma OHAL’ê rawestînin û ji rejîma yekzilamî re bibêjin raweste, em ê bi dengekî xurt bibêjin ‘na’. Li her dera ku dengê me qut dikin, em ê bêtir hebûna xwe biparêzin. Em ê mal bi mal, kuçe bi kuçe, derî bi derî bigerin û ‘na’yê bi rêxistin bikin û ez bawer dikim ku dê ‘na’ û jin bi ser bikevin.”
*AMED - DÎHABER*

## ‘Felsefeya Ocalan bersiva girîng e’

**LI AMEDÊ JI ALIYÊ parlamenterê HDP’ê, Tevgera Jinên Azad ( TJA), HDK û Meclisa Dayikên Aştiyê ve starta kampanyaya ‘Ji dîktatoriyê re na’ hat dayîn.**
**Piştî vê yekê aktîvîsta TJA’yê Arzu Karaman û hevberdevka HDK’ê Gulistan Koçyîgît der barê kampanyayê de axivîn. Aktîvîsta TJA’yê Arzu Karaman diyar kir ku divê hemû jin li dora kampanyayê bibin xelek û ji bo kampanyayê xebatan bimeşînin ji bo ku dawî li dîktatoriyê were anîn. Hevberdevka HDK’ê Gulistan Koçyîgît jî diyar kir ku li dijî hemû polîtîkayên AKP’ê ji bo bersiveke ji herêmê rêvebirina kampanyaya “na”yê ji aliyê jinan ve girîng e û wiha got: “Helbet mirovekî ku bi pardîgmaya xwe bersivekê bide ve pergalê heye ew jî Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan e. Mîmarê pergala hevserokatiyê, wekheviyê û avakarê felsefeya ‘heta jin azad nebe, civak azad nabe’ û yê ku girîngiya kampanyayê jî nîşanî me da Ocalan e. Ji ber vê jî em ê bi hemû hêza xwe vê kampanyayê pêk bînin.” AMED - ŞÛJIN**

# Kobanê bû warê mirovahiyê

Kobanê piştî berxwedaneke bêhempa ku 134 rojan domand, di 26’ê çileya 2015’an de rizgar bû û li tevahiya cîhanê deng veda. Şervanên YPJ’ê yên ku cihê xwe di şerê rizgarkirina Kobanê de girtiye, kêliyên berxwedanê vegotin û salvegera Kobanê di serî de li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, têkoşerên YPJ/YPG û gel pîroz kir.

Fermandara YPJ’ê Sorxwîn Rojhilat da zanîn ku şerê li Kobanê şerê îradeyê bû û wiha got: “Piştî çeteyên DAIŞ’ê jinên êzidî yên Şengalê girtin û li bazaran firotin, hêrsa min zêde bû. Çeteyan bi destavêtina jinan, ne tenê gelê kurd hedef girt, di şexsê jina kurd de xwest hemû mirovahiyê têk bibe. Ji ber vê yekê, me wek YPJ di şerê Kobanê de, ne tenê pêşengiya gelê kurd kir, me pêşengtiya hemû mirovahiyê kir. Dijmin bi her cureyê teknîka xwe bi ser me de dihat, lê me wek YPG/YPJ’ê bi vîna xwe şer kir û me ew têk birin. Jinan pêşengiya gelê kurd û Rojhilata Navîn kir.”

Rojhilat anî ziman ku ew wek jin û wek şervaneke YPJ’ê bang li hemû jinên Rojhilata Navîn, kurd, ereb, çerkez, asûrî û hemû pêkhateyên Rojava dike û ji bo azadiya jiyanê û tolhilanîna hemû jinan ji çeteyên DAIŞ’ê tev li refên YPJ’ê bibin û parastina xwe û welatê xwe bikin.

Şervana YPJ’ê Asmîn Avesta diyar kir ku berxwedana Kobanê hêzeke birêxistinkirî di nav jinên Rojava de pêk anî û di kesayeta heval Arîn, Zehra, Rêvana, Gulan û gelek rêhevalên wan ên jin ku xwe kir mertal, planên dijmin têk birin. Avesta destnîşan kir ku li Kobanê ruhê Zîlanê serî netewand û zindî bû û wiha got: “Min û hevalên xwe digot em ê canê xwe bidin lê em nahêlin lingên dijmin li ser vê axê bimîne û me wisa jî kir. Wek YPJ me feraseta ku dibêje ‘jin nikare şer bike’ têk bir. Lê berxwedana jinên kurd wekî efsaneyekê li pêşiya wan sekinî û ew têk birin û niha jî YPJ pêşengiya hemleya Reqqayê dike.” Avesta ji bo jiyaneke azad û wekhev banga birêxistinbûnê li jinan kir.

### PÊŞENGIYA JINAN

Şervana YPJ’ê Newroz Agirî kêliyên rizgarkirina Kobanê jî destnîşan kirin ku pêşengiya wê Rêvana û Arînan dikir û wiha got: “Îro jî YPJ’ê pêşengiya hemleya rizgarkirina Reqqayê dike. Jin li rojavayê Kurdistanê di hemû qadan de pêşengiyê dikin. Li Kobanê çekên me yên giran tune bûn, lê berxwedaneke mezin hebû. Bangewaziya min li hemû jinan ew e ku tev li YPJ’ê bibin û ji Rojhilata Navîn re pêşengiyê bikin.”

### GOVENDA AZADIYÊ

Şervana YPJ’ê Penaber Leman jî diyar kir ku pêşengiya jinan li Kobanê peşengiya mirovahiyê bû û ev tişt ragihand: “Me bingeha fikra azad ji Rêber Apo girtibû. Ev gel bi zarokên xwe ve bi fikr û ramanên Rêber Apo mezin bûbû. Hevalên şehîd digotin ‘Dibe ku em şehîd bikevin lê em vê axê ji dijmin re bernadin.’ Ji mirinê tirs tune bû. Pirî caran di navbera me û dijmin de tenê dîwarek dima, me dîwar bi tilîliyan kun dikir û li kêleka wê govendek digerand. Mizgîniya azadiyê bi berdêlên giran pêk hat. Me wek govenda azadiyê bi coş şer dikir. Tiştê ku hişt em bi ser bikevin jî ev sekna me û bawriya me bû.” Leman got ku planên çeteyên DAIŞ’ê û Erdogan li Kobanê têk çûn û gelê kurd jî li Kobanê xwedî li dîroka xwe derket û bi berxwedaneke mezin bi ser ket.
*KOBANÊ - ŞÛJIN*



# Wezîra AKP’ê wekî zilaman diaxive

Wezîra Polîtîkayên Civakî û Malbatî Fatma Betul Sayan Kaya, îmze avêt bin skandaleke din û jin zêdetir mexdûr kirin.



Kaya da zanîn ku dê navendên şêwirmendiyê yên malbatan ku bi pirsgirêkên jinan re eleqedar dibin, bigirin. Kaya hinceta girtinê jî wiha vegot: “Jinên zewicî yên ku diçin van navendan, ji hevjînên xwe vediqetin. Ev navend dibin sedema ji hev veqetandina jin û zilaman. Kesên ku dîplomaya wan tune ye jî van navendan vedikin. Ji bo ku em pêşiya wan bigirin me xebat dane destpêkirin.” *AMED*


# Li Rojava gavên dîrokî

Li kantona Cizîrê Koordînasyona Jinan a Rêveberiya Xweser bi armanca berdewamiya hemleya li dijî tundiya li ser jinan û bilindkirina asta zanistî ya jinan, di bin dirûşma “Kesayeteke azad mîsogeriya jiyana azad û serkeftina şoreşê ye” hemleyek da destpêkirin. Hemleya ku di 11’ê çileyê de dest pê kir dê heta 8’ê Adarê berdewam bike.

Endama Rêveberiya Meclisa Zagonsaz Perwîn Muhemed da zanîn ku wan li herêmên rizgarkirî ji bo jinan gavên dîrokî avêtine û wiha got: “Li rojavayê Kurdistanê ji bo jinan gavên dîrokî hatine avêtin. Koordînasyona jinan jî bi armanca ku têkiliyên xwe bi civakê û rêxistinên jinan re xurt bike, hatiye avakirin. Ev koordînasyon bilindkirina asta zanistî ya jinan esas digire. Ev hemleya ku me niha dest pê kiriye, berdewamiya hemleya danasîna tundiya li ser jinan e. Em tê de rewşa jinan bi rêya semîner û civînan ji gel re radigihînin û rêyên çareseriya wê nîqaş dikin û bi hev re parve dikin.” *RIMÊLAN - ŞÛJIN*

## Jin hevdîtinan protesto dikin

Li Girtîgeha Jinan a Tîpa C a Tarsus a Mêrsînê, binpêkirina mafan didome. Serokê Komeleya Hiqûqnasên Hevdem (ÇHD) a bi KHK'ê hat girtin parêzer Mehmet Altuntaş ê bi girtiyan re hevdîtin pêk anî, diyar kir ku li dijî girtî û hikumxwaran binpêkirinên mafan didomin û anî ziman ku 2 hefteyan carekê destûra derketina revîrê tê dayîn. Altuntaş bi lêv kir ku jinên li Girtîgeha Jinan a Tîpa C a Tarsusê, li dijî binpêkirinên mafan biryara derneketina hevdîtinê daye. û MÊRSÎN



## Dixwazin li malê bijîn

Vesîle Yuksel di 21'ê Kanûnê de li Mêrdînê hat binçavkirin û bi zarokên xwe yên bi navê Arîn Mîrxan û Avesta re ket girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê. Vesîle bi hinceta wêneyên birayên xwe yên jiyana xwe ji dest daye di çapemeniya civakî de parve kirine, gazî îfadê kirin û dozger jê pirsa 'Tu PKK'ê wek rêxistina terorê dibînî?' pirsî û piştî ku Vesîleyê bersiva 'na' da bi du zarokên xwe re hat girtin. Avesta û Arîn 5 rojên hefteyê li cem dayika xwe li girtîgehê û du rojan jî li cem bavê xwe dimînin. MÊRDÎN



## Bo wêneyên şermê biryara neşopandinê

Par di meha adarê de li navçeya Sûrê ya Amedê sivîl hatin tahliyekirin û polîs û leşkeran ew şilfitazî kiribûn û wêneyên wan li ser medyaya civakî parve kiribûn. Li ser vê Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Amedê jî heman leşker û polîsan gilî kiribûn, lê Serdozgeriya Komarê ya Amedê der barê vê giliya sûc de, biryara neşopandinê da. Dê ÎHD'a Amedê, ji bo biryara neşopandinê ya dozgeriyê bê rakirin, serî li Dadgeriya Cezayê Sulhê ya Nobedar a Amedê bide û dê îtîraz bike." AMED



## Ji dayikê re 8 sal ceza hat xwestin

Li Êlihê, bi îdiaya beşdarî civînên Meclisa Bajêr a Êlihê ya ku ji aliyê gelek saziyên sivîl ve hat avakirin bûye, der barê endama Dayikên Aştiyê ya Êlihê Sultan Azboy (62) de bi îdiaya "Endamtiya rêxistinê" ji aliyê 2'yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Êlihê ve, 8 sal û 9 meh cezayê girtîgehê lê hat birîn. Heke cezayê Azboyê ji aliyê Dadgeha Bilind ve bê tesdîqkirin, dê bikeve girtîgehê. Sultan Azboy got ku ew dayika aştiyê ye ji ber wê jî dikare tevlî çalakiyan bibe. ÊLIH



# Dê Cizîrê ji AKP'ê re nehêlin

**Dewleta tirk ji bo taxa Cûdî ya Cizîrê ku wêran kir, biryara 'veguherîna bajar' da. Cizîriyên ku bi rêya afîşên li bilboardan bi vê projeyê hesiyan, nerazîbûn nîşan dan**




"Karê înşaatê dest pê dike. Yên xwedî maf dibin xwedî mal". Ev gotin bi tîpên mezin li bilbordên li kolana herî qelebalix a Cizîrê hatiye nivîsandin. Ev afîş di heman demê de nîşaneya mexdûriyeteke mezin e. Bajarê ku bi mehan hat şewitandin, xerakirin û hewl dan bê valakirin, vê carê dê bi projeya 'veguherîna bajar' hewl bidin vê yekê bikin.

Haya kesî ji projeya Veguherîna Bajar a Qonaxa 1'emîn a Cizîrê (taxa Cûdî) nîn e ku Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê dimeşîne. Kes nizane bê ka ev proje çi ye. Agahî ji keyayê taxê re jî nehatiye dayîn. Li gorî agahiyan, mirovên ku tapûya wan heye jî dê li gorî mulkiyetê berdêlê bidin û mirovên ku tapûya xwe ya 20 salan heye jî dibe ku bê nîşandan ku li cihekî bêdestûr jiyane.

Taxa Cûdî wargeha wan malbatan e ku di salên 90'î de gundên wan bi zorê hatin valakirin û ji neçarî koçî bajêr kir. Di vê projeyê de dê mijara kirîn û firotina xaniyan li gorî şert û mercên heyî yên bazarê bê kirin û bi vî rengî dê mirovên xwedî maf, bixin bin deynên dûdirêj.

**AGAHÎ NEDANE**

Der barê projeyê de agahî ji kesî re nayê dayîn. Di malpera Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê de jî qala vê projeyê nayê kirin. Gelê Cizîrê bi erênî nêzî vê projeyê nabe ku dê wan careke din mexdûr bike.

Pereyê ku diviyabû ji bo avahiyên ku ji ber şerê par zirar dîtin bihatina dayîn, hê nehatine dayîn. Di heman demê de xisara rasteqîn nehat tespîtkirin û cizîriyan li dijî vê yekê serî li dadgehê da.

Li ser projeya 'veguherîna bajar' ku gelê Cizîrê jê ne razî ye, bi dehan pirs hene. Cizîriyên naxwazin ji taxên xwe derkevin, dixwazin bi derfetên xwe li ser erdê xwe xaniyan çêkin.

Kesê bi navê A.O. ê li taxa Cûdî dimîne, da xuyakirin ku ew naxwaze erdê xwe ji bo veguherîna bajar bide. A.O. destnîşan kir ku dewlet ji bo ku wan hewcedarî xwe bike, çi jê tê dike.

**LI DIJÎ TOKÎ'YÊ NE**

Ahmet Tokgoz jî da xuyakirin ku wan berî salekê serlêdan kirin, lê hê jî ji bo tespîtkirina xisarê tiştek nehatiye kirin. Ji bo mirovên li vê taxê yên xisareke mezin li xaniyên wan bûne û di kirê de ne, piştgirî nehatiye dayîn. Niha jî dibêjin dê TOKÎ bike. Em naxwazin xaniyên xwe bidin dewletê; heke dest lê wernede, em ê xaniyên xwe bi xwe çêkin."

Tokgoz diyar kir ku wek şêniyên taxê, wan serî li dadgehê daye û wiha got: "Em ê Cizîrê ji wan re nehêlin. Em ê mafê xwe ji wan re nehêlin." *ŞIRNEX - ANF*

# Bi mehan e tê tehdîdkirin

Li Wanê, 10 meh berê mala Remziye Bor (27) hatibû gulebarankirin û di gulebaranê de Bor bi giranî birîndar bûbû û li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest dabû.

Hevjînê Bor, Îrfan Bor ku hate girtin, hat diyarkirin ku hem li qereqolê hem jî li girtîgehê rastî îşkence û gefxwarina polîsan hatiye. Bor nêzî 10 mehan e li Girtîgeha Tîpa T a Wanê tê ragirtin û kekê wî Cemil Bor got ku di 3 rojên binçavkirinê de bi wêneyên hevjîna wî ya birîndar gef li birayê wî hatine xwarin û anî ziman ku her hefte polîs diçin girtîgehê û gefan li birayê wî dixwin û dibêjin "sûc" qebûl bike.

Bor da zanîn ku ji roja ku birayê wî hatiye binçavkirin û heta girtinê her tim rastî gefxwarinan tê û wiha domand: "Îrfan, ji roja ewil heta niha tim rastî gefan, çewisandinan tê. Hema bêje polîs her hefte diçin girtîgehê û ji birayê min re dibêjin 'tu yê hemû sûc qebûl bikî, tu yê bibêjî her tişt min kir' ji bo ku polîs sûcdar nebin." *WAN - DÎHABER*



# Dilê wê ji bo Şengalê lê dide

Yek ji êzidiyên ku piştî êrîşa DAIŞ'ê ji Şengalê hatin Amedê û ji wir jî çûn Midyadê Leyla Elî ye. Dilê Leylayê, ji bo dayika wê ya 4 caran ji destê DAIŞ'ê reviyaye û kesên wan ji DAIŞ'ê rizgar kirine, lê dide.

Leyla diyar kir ku li van deran jiyana di konan de zehmet e, zivistanan sar, havînan jî germ e û dibêje ji bo nexweşxane û dermanan jî pêdivî bi pereyan heye û wiha got: "Em ew qasî rastî zehmetiyan hatin ku êdî em nikarin tu gotinekê jî bikin. Ji bo min a herî êşbar ew e ku dayika min 4 caran ji aliyê DAIŞ'ê ve hatiye revandin."

Leyla wê pêvajoyê wiha vedibêje: "Dayika min pir pîr e, perîşan e. Dema min bihîst dayika min ketiye destê DAIŞ'ê, bi rojan min dua kir; 'Xwedêyo min bikuje, lê bila dayika min di destên wan de nemîne.' Hîn jî min dayika xwe nedîtiye. Li gorî tiştên tê gotin, dema wan digirin carinan wan li hin cihan disekinînin. Vê demê dayika min direve. Dema dîsa tê desteserkirin, bi wî awayî jî xelas dibe. Heke careke din jî zeft bikirana dê ew bikuştana."

Leyla anî ziman ku piştî dayika wê xelas dibe nexwestiye were Tirkiyeyê û wiha got: "Dayika min got, 'Ez ê biçim gundê xwe.' Di navbera gundê dayika min û Şengalê de çiyayek heye. Me ew qas zilm, xerabî dît ku êdî em nikarin wan bînin ziman."

Leyla herî dawî got ku heke PKK'ê nebûya dê ew ê rizgar nebûna û ew bi saya PKK'ê rizgar bûne. *MÊRDÎN DÎHABER*



# Wek qadên îstîhdamê dibînin!

Bi zêdebûna girtinan re, li gelek bajaran girtîgehên nû yên kapasîteyên wan di navbera hezar û 500 û 5 hezarî de, tên avakirin.

Li Manîsa, navçeya Turkoglu ya Mereşê, Mersîn, Edene, navçeya Islahiye ya Dîlokê, li navçeya Patnosê ya Agiriyê û Erziromê avakirina gelek girtîgehan didome.

Li gorî agahiyên endezyarekî ku di înşaata girtîgehê de dixebite, pêşnûma ji Ewropayê hatine û dê di nav kampusa girtîgehê de atolye, nexweşxane û ji bo personelan jî lojman hebin. Ji bo 7 hucreyên yekkesî jî tenê qadeke hevpar tê çêkirin.



Li gel vê daxuyaniyên serokê şaredariyê Ozman Okumuş ên têkildarî girtîgeha li navçeya Turkoglu ya Mereşê tê çêkirin jî balê dikêşin. Okumuş, di daxuyaniya xwe ya li malpera şaredariyê de çêkirina girtîgehê wek waadeke hilbijartinê pênase kir û wek qadeke îstihdamê nîşan dide. *AMED - DÎHABER*

## Li Yemenê metirsiya xelayê

**ALÎKARÊ SEKRETERÊ** Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) û serokê Daîreya Koordînasyona Alîkariya Mirovî (OCHA) Stephen O'Brien der barê rewşa dawîn a Yemenê de axivî û diyar kir ku li Yemenê pêwîstiya 14 milyon kesî bi alîkariya xurekê heye. O'Brien da zanîn ku heke bi awayekî lezgîn alîkarî neyê kirin, dibe ku li Yemenê di mehên pêş de metirsiyeke giran a birçîbûn û xelayê rû bide û wiha got: "Pêwîstiya 2 milyon kesî bi alîkariyeke lezgîn heye. Hejmara zarokên ku nikarin bên xwedîkirin jî gelekî zêde bûye û serê her 10 deqeyan zarokek jiyana xwe ji dest dide." O'Brien di dawiya axftina xwe de hişyarî da û ragihand ku ji ber şer depoyên genim kêm maye ku vala bibin û ji ber vê yekê dibe ku îsal li Yemenê drameke mezin a mirovî rû bide. **BERN**



# Li DYA'yê nîqaşa 'Birayên Misilman'

**Pêkanînên serokê Amarîkayê Donald Trump ên binîqaş berdewam dikin. Piştî îmzekirina biryarnameya lêkirina diwarê li ser sînorê Meksîkayê, nîqaşa 'Birayên Misilman bibe rêxistina terorê' dest pê kir**



Li Amerîkayê pêkanînên serokê nû Donald Trump berdewam dikin. Trump sozên xwe yên ku di dema kampanyaya hilbijartinê de dan, yek bi yek bi cih tîne û ev pêkanînên wî dibin sedema nîqaşan. Yek ji van pêkanînan jî nîqaşa ku dê rêxistina Birayên Misilman a ku li Rojhilata Navîn li gelek welatan birêxistinkirî ye bikeve nav lîsteya rêxistinên terorê.

Hat ragihandin ku şewirmendên serokdewletê Amerîkayê Donald Trump ev mijar nîqaş kirine. Li gorî nûçeya Ajansa Nûçeyan a Reutersê şewirmendê ewlehiya neteweyî yê Trump Micaael Flynn pêşniyar kiriye ku Birayên Misilman wek rêxistina terorê bê dîtin û li dijî rêxistinê jî mueyîde bên bikaranîn.

Ev nîqaşa li Amerîkayê ji ber ku alîkarekî herî mezin ê rêxistinê Erdogan e, li bendê ye ku têkiliyên di navbera Amerîka û Tirkiyeyê de xera bike. Ji ber vê yekê şîroveya Tirkiyeyê ya der barê vê mijarê de tê meraqkirin.

**BACE ZÊDE DIKIN**

Li aliyê din qeyrana di navbera Amerîka û Meksîkayê de ya ji ber lêkirina dîwarê di navbera wan de jî berdewam dike. Serokê Amerîkayê Donald Trump ê ku beriya çend rojan biryarnameya der barê lêkirina dîwar de îmze kir, bi biryar e ku lêçûnên projeya dîwarê sînor bi Meksîkayê bide dayîn.

Berdevkê Qesra Spî Sean Spicer der barê projeya lêkirina dîwar de axivî û ragihand ku ji bo lêkirina dîwar dê baca li ser hemû berhemên ji Meksîkayê bên kirîn, ji sedî 20 bê zêdekirin. Berdevk Spicer da xuyakirin ku bi saya zêdekirina bacê dê salane 10 milyar dolar bi dest bixin û bi vê yekê dê maliyeta dîwar jî çareser bibe. ***WASHINGTON***

### Metirsiya 'Herêma Ewle'

**PÊŞNIYARA** 'Herêma Ewle' ya ku beriya niha ji aliyê serokomarê Tirikiyeyê Recep Tayîp Erdogan ve dihat bilêvkirin, piştî ku ji aliyê serokê Amerîkayê Donald Trump ve hat ziman, li Enqereyê bû sedema metirsiyê. Ji ber ku daxwaza 'Herêma Ewle' ya Trump û Erdogan ji hev cuda ne û Tirkiye ji ber vê yekê ketiye nav metirsiyeke mezin. Hat ragihandin ku daxwaza Trump a 'Herêma Ewle' ku tê payîn di xaka Rojava de bê avakirin, xeyalên Tirkiyeyê yên çend salan têk dibe.

# Rûsya û PYD'ê mafên kurdan nîqaş kirin

Civîna li paytexta Rûsya Moskovê ya di navbera Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov û muxalîfên li dijî rejîma Baasê de pêk hat. PYD jî di nav de 14 hêzên muxalîf tev li civînê bûn û maqeqanûna ji aliyê Rûsyayê ve ji bo pêşeroja Sûriyeyê hat amadekirin, nîqaş kir. Nûnerê PYD'ê yê Fransayê Xalid Îsa der barê civînê de axivî û diyar kir ku li ser demokratîkbûna Sûriyeyê nîqaş kirine.

Xalid da zanîn ku beşeke mezin a nîqaşê li ser maqeqûna Sûriyeyê ya ku ji aliyê Rûsyayê ve hatiye amadekirin, bûye û wiha got: "Me bi Lavrov re ev mijar nîqaş kir. Pişre me bi Cîgirê Wezîr û Nûnerê Serokdewletê Rûsyayê birêz Bagdanov û çend berpirsyarên din re jî heman mijar nîqaş kir. Xalid bi lêv kir ku di civînan de amadekariyên civîna Cenevreyê ya 4'an jî nîqaş kirine û ev agahî parve kirin: "Rûsyayê destnîşan kir ku dê Cenevre 4 bêyî kurdan bi taybet jî bêyî PYD'ê pêk neyê. Nûnerên muxalîf ên di bin bandora Tirkiye û ENKS'ê de ji ber nerazîbûna Tirkiyeyê tev li civînan nebûn."

Xalîd diyar kir ku otonomiya çandî ya kurdan ji aliyê Rûsyayê ve hatiye qebûlkirin, lê wan ev yek bes nedîtiye û wiha pê de çû: "Me navê komarê yê ku hatiye guhertin û bûye Komara Sûriyeyê û pirolîbûna Sûriyeyê erênî dît. Lê otonomiya çandî ji ber ku têra kurdan nake me ev qebûl nekir. Me ji wan re behsa zagona 1920'an kir ku tê de Sûriyeyeke federal tê niqaşkirin. Me destnîşan kir ku Projeya Federalîzma Demokratîk a ku Xweseriya Demoratîk û Federasyona Bakurê Sûriyeyê pêşkêş kiriye, em wê rast dibînin."

Li aliyê din bi destpêkirina civînê re civîna Cenevre 4 ku dihat payîn di 8'ê sibatê de pêk bê, hat taloqkirin. Hat zanîn ku civîn ji ber ku muxalîfên cîhadîst beşdarî civîna Moskovê nebûne heta dawiya sibatê hatiye taloqkirin. ***MOSKOV***



## DMME bûye navenda dozên Tirkiyeyê

Serokê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) Guido Raimondi di rûniştina daxuyaniya çapemeniyê de bîlançoya 2016'an aşkera kir.

Raimondi diyar kir ku li gorî bîlançoyê di sala dawîn de, bi taybetî piştî darbeya 15'ê tîrmehê û ji bo DMME'yê ji Tirkiyeyê 8 hezar û 308 dozên nû hatine û wiha got: "Heke em li gorî salên din bidin ber hev, ji sedî 300 zêde bûye. Di 2015'an de ji Tirkiyeyê 2 hezar û 212 doz ji bo DMME'yê hatibûn vekirin. Li gorî daneyên DMME'yê di nav sala dawîn de hikumeta tirk ji 88 dozan hatiye mehkûmkirin. Ji van 88 dozan gefa kuştinê û neparastina jiyanê, 9 îşkence û nêzîkatiyên xirab, 22 gefên li azadî û mafê ewlehiyê ne."

Raimondi diyar kir ku li DMME'yê ji 47 welatan 80 hezar dosyayên dozê kom bûne û ji van dosyayan ji sedî 15 yên Tirkiyeyê ne. ***STRASBOURG***

## Swêdê zextên li ser elewiyan nîqaş kir

Parlamenterê Partiya Karkeran a Sosyal Demokrat Ander Osterberg ku partiya wî şirîka herî mezin ê hikumeta Swêdê ye, di rûniştina parlamentoyê de, êrîşên li Tirkiyeyê yên li dijî elewî û xiristiyanan xist rojevê.

Osterberg da xuyakirin ku rêxistinên îslamî yên tund ên li herêmê dirûşma "Bila xiristiyan biçin Beyrûdê, elewî bikevin gorê" diqîrin û destnîşan kir ku zext li elewî, ermenî û asûriyan tê kirin.

**REWŞA XETERNAK**

Osterberg da zanîn ku di herikîna dîrokê de pir zext li elewiyan hatine kirin û wiha pê de çû: "Ji 1989'an û vir ve rewşa elewiyan baştir bû, lê elewî hê jî li Tirkiyeyê wek hindikahiyan nayên qebûlkirin."

Alîkara Wezîrê Karên Derve ya Swêdê Isabella Lovin jî di parlamentoya welat de diyar kir ku fikarên Osterberg ên li ser Tirkiyeyê di heman demê de fikarên wê ne jî û anî ziman ku ne tenê li dijî muxalefetê, her wiha li dijî civaka sivîl, medya û hindikahiyan jî li Tirkiyeyê rewşeke gelekî xeternak heye. ***STOCKHOLM***

## Wezîrê Gambiyayê hat binçavkirin

Wezîrê Karên Hundir ê Gambiyayê Ousman Sonko yê ku serokdewletê wê Yahya Jammeh piştî têkçûna xwe navê xwe bi 'Neterikandina wezîfeya serokdewletiyê' bi cîhanê da bihîstin, li Swîsreyê hat binçavkirin. Sonko 2 meh beriya niha li Swîsreyê serlêdana penaberiyê kiribû. Hat ragihandin ku Sonko ji ber serlêdana Saziya Civaka Sivîl a Navneteweyî (TRIAL) ku li hemberî sûcên li dijî mirovahiyê tê dikoşe, hatiye binçavkirin. **BERN**

## Wezîrê dadê yê Hollandayê îstîfa kir

Wezîrê Dadê yê Hollandayê Ard Van Der Steur ê ku bi tazmînata bazirganekî narkotîkê ji dewletê girtiye û veşartiye dihat sûcdarkirin, îstîfa kir. Wezîr Ard Van Der Steur der barê îstîfaya xwe de daxuyaniyek da û ragihand ku ji ber ku parlamentoya Hollandayê jê ne bawer e, biryara îstîfaya xwe daye. Hat ragihandin ku Ard Van Der Steur dê îstîfaya xwe di rojên pêş de radestî qralê Hollandayê Wilhelm Alexander bike. **LAHEY**

www.arsivakurd.org

Rojeva Medya
28 Çile 2017 Şemî

## Ji bo Helebê banga girîng

Gelek malbatên taxên rojhilatê Helebê pêwîstiya wan bi alîkariyê heye. Meclisên wan taxan ji bo naskirina malbatên xizan xebateke nû da destpêkirin. Bi bidawîbûna vê xebatê dê navên welatiyan werin diyarkirin û radestî rêxistinên alîkariyê werin kirin. Endamên komîteya vê xebatê anî ziman ku pêwîstiya gelek malbatan bi alîkariyên lezgîn heye û banga alîkariya li tevahiya rêxistinên mirovî yên navneteweyî û herêmî kir. HELEB



## Dorpêç rewşê giran dike

Ji ber rewşa dorpêça li ser taxên rojhilatê Helebê yên rizgarkirî, gelek pêdiviyên jiyanî kêm in. Li Navenda Heyva Sor a Kurd a taxa Hulokê tevî kêmbûna dermanan, rojane 290 nexweş têne dermankirin. Bijîşkên navendê bang li rêxistinên mirovî kir ku dermanan û alavên tenduristiyê ji wan re bişînin. Têkildarî mijarê jina bi navê Emîne Qeşaş jî got ku rewşa wan a tenduristiyê ne baş e û derman jî nîn in. Welatiyan banga alîkariyê li raya giştî kir. HELEB



## Rêveberiya nû hilbijartin

PYD'ya Tirbespiyê bi dirûşma 'Ji Rojava ber bi Sûriyeyeke demokratîk ve' duyemîn kongreya xwe li dar xist. Di kongreyê de hevserokên PYD'ê Asya Abdullah û Salih Muslim jî amade bûn. Di encama kongreyê de Mihemed Salih Yûsiv, Yasir Xelef Şehnaz Ebdo ji bo rêveberiya xeta Sinceqê, Ibrahîm Ereb û Zîlan Silêman ji bo xeta Aliya, Silêman Bedir Hisên, Xalid Silêman Hisên, Nesîm Şêxo, Cewahir Temo û Rojîn Îbrahîm jî ji bo Tirbespiyê hatin hilbijartin. TIRBESPIYÊ



## Silûk vedigere demên berê

Bi rizgarkirina Silûkê a Girê Spî welatî vegeriyan malên xwe. Silûk a ku bi pîşesaziyê tê nasîn, bi vegera welatiyan careke din di warê pîşesaziyê de bi pêş dikeve. Welatiyên li herêmê der barê mijarê kêfxweşiya xwe anî ziman û destnîşan kir ku ew alavên xwe yên çandinî, tamîr û sererastkirinê ji bajarên Minbicê û Serêkaniyê pêşwazî dikin. Bi vegera gel saziyên rêveberiya xweser erka çavdêriya bajarok û peydakirina pêdiviyên jiyanî pêk tînin. GIRÊ SPÎ





# Têkçûna xwe bi kuştinê vedişêrin

NAVENDA NÛÇEYAN

**Artêşa tirk a dagirker bi balafirên şer û çekên giran êrîşî welatiyên sivîl ên Babê kir û di encamê de 10 sivîl qetil kirin. Her wiha artêşa tirk li ser sînorê Dêrikê jî 2 sivîl qetil kirin û 5 jî birîndar kirin.**

Bi armanca pêşîlêgirtina bi hev ve girêdana kantonên Efrîn û Kobanê û her wiha têkbirina rojeya federaliya demokratîk, dewleta tirk a dagirker di 24'ê tebaxa 2016'an de bi hinceta 'Şerê li dijî DAIŞ'ê' bi operasyona 'Mertalê Firatê' dest bi dagirkirina herêma Şehbayê kir. Di encamê de jî Cerablus, El Raî û gelek bajarokên din ên li herêmê hatin dagirkirin.

Artêşa tirk û çeteyên wê di vê operasyona dagirkirinê de heta niha bi dehan komkujî pêk anîn û di encamê de jî zêdetirî 370 sivîl qetil kirin û bi hezaran jî birîndar û seqet hêlan. Li gorî agahiyan, artêşa tirk di 26'ê çileyê de li dijî sivîlên li Babê komkujiyek pêk anî û di encamê de bi qasî hatiye zelalkirin, 10 sivîl hatin qetilkirin.

Her wiha artêşa tirk di şeva 26'ê çileyê de welatiyên gundê Mezra yê Beravê yê Dêrikê hedef girtin. Di encamê de 2 sivîl hatin qetilkirin û 5 jî birîndar bûn. Welatiyên gund tevî gulebarana leşkeran jî 4 birîndar rakirin nexweşxaneya Dêrikê. Birîndarek û cenazeyên welatiyan hin li ser sînor in. Welatiyên birîndar da zanîn ku dema ku dixwest biçin gundê xwe ji hêla leşkeran ve hatine gulebarankirin.

# Gelê Kobanê 2 cejn bi hev re pîroz kirin

**Salvegera rizgarkirina Kobanê û ragihandina rêveberiyên xweser li Kobanê hat pîrozkirin. Di şahiyê de hat diyarkirin ku berxwedana YPG/YPJ'ê bûye berxwedana tevahiya mirovahiyê**

Welatiyên Kobanê bi boneya 2'yemîn salvegera rizgarkirina Kobanê û 3'yemîn salvegera ragihandina rêveberiya xweser a kantonê, li Qada Azadiyê ya Kobanê şahiyeke pîrozbahiyê li dar xist.

Bi pêşengiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Kobanê û Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) 2'yemîn salvegera rizgarkirina Kobanê û 3'yemîn salvegera ragihandina rêveberiya xweser a kantonê li Qada Azadiyê bi tevlîbûna bi sedan welatiyan şahiyek li dar xist. Di şahiyê de tevî welatiyan, bi dehan endamên sazî û desteyên rêveberiya xweser jî amade bûn.

**MÊVANÊN ŞAHIYÊ**

Her wiha di şahiyê de hevserokên PYD'ê Asya Ebdullah û Salih Muslim, berdevka YPJ'ê Nesrîn Ebdullah, hevseroka Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Cizîrê Heyfa Erebo û gelek serokên desteyan û cîgirên wan, şandeyek ji Kantona Efrînê, rêveberiya Meclisa Sivîl a Minbicê, rêveberiya Herêma Girê Spî, Sirîn, Şengal û fermandarên Meclisa Leşkerî ya Minbicê jî amade bûn.

**YEKITÎ XURT KIR**

Di şahiyê de fermandarê YPG'ê Mehmûd Berxwedan salveger li gel pîroz kir û da zanîn ku berxwedana YPG/YPJ'ê hê jî li kolanên Kobanê zindî ye. Fermandara YPG/YPJ'ê ya kantonê Fîdan Kobanê jî destnîşan kir ku destkeftiyên gelê kurd bi saya şehîdan pêk hatine û anî ziman ku berxwedana Kobanê yekitiya gelê kurd xurt kir û bû sembola berxwedana hemû mirovahiyê.

Li qada şahiyê pankartên 'Kobanê ji we mezintir e', 'Rêveberiya Xweseriya Demokratîk mîsogeriya jiyana hevbeş e' û 'Federaliya Demokratîk nûnertiya îradeya siyasî ya tevahiya pêkhateyên civakê ye' û posterên şehîdan hatin daliqandin.

*KOBANÊ - ANHA*

## Berxwedana Kobanê

Yekitiya Ciwanên Rojava (YCR) destnîşan kir ku Kobanê ji bo hemû gelan bûye nimûneya demokrasî, azadî, wekhevî û jiyana watedar û daxuyaniya xwe wiha bi dawî kir: "Li Kobanê şer di navbera jiyan û mirin, hebûn û tunebûn, ronahî û tariyê de bû. Ya ku li Kobanê bi ser ket, rastiya ciwanên şerker û demê bû. Di Kobanê de nasnameya ciwanên azad ji nû ve hate hûnandin."

**'SERKEFTINA BINDESTAN'**

Biryargeha Şoreşger di daxuyaniya xwe de rizgariya Kobanê li hemû gelan pîroz kir û serkeftina Kobanê wek serkeftina bindestan pênase kir. Biryarêgehê ev tişt parve kirin: "Serkeftina Kobanê û şoreşa Rojava şoreşa jinan e. Serkeftina Kobanê mizgîniya pêkanbûna rizgariyê, mizgîniya jiyana azad a gelan, serkeftina jinan a li dijî sîstema serdest, li rûyê hemû hêzên emperyalîst, û Erdogan sîleyek e."

**KOBANÊ ÎLHAMA GELAN E**

Fermandariya Giştî ya YBŞ'ê bi daxuyaniyekê rizgarkirina Kobanê li şehîdan, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li gelê Kobanê û li hemû gelên Kurdistanê pîroz kir. YBŞ'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku mirovahî li Kobanê şahidiya destaneke lehengiyê kiriye û wiha bi dawî kir: "Em şehîdên nemir ên vê destanê bi minetdarî û rêzdarî bi bîr tînin. Ev berxwedana bû îlhama hemû gelan." KOBANÊ



## Li Qamişloyê pîrozbahiya Kobanê

**BI BONEYA 2'YEMÎN** salvegera rizgarkirina Kobanê bi tevlîbûna nûnerên rêveberiya xweser û dehan welatiyan, li Qamişloyê şahiyek hat lidarxistin. Di şahiyê de hevserokê Desteya Çand û Hunerê Îlyas Seydo salvegera rizgarkirina Kobanê li beşdaran pîroz kir û da zanîn ku berxwedana Kobanê yekitiya gelê kurd xurt kir. Seydo anî ziman ku her çi qas êrîşên li dijî kurdan mezin jî bin dê nekarin vîna wan a azad têk bibin. Piştî axaftinan helbestvanên Kobanê Can Îbrahîm û Lorîn Kobanê jî helbestên xwe, dengbêj Nesrîn Botan stranên xwe û koma şanoyê ya Çira jî berhemên xwe pêşkêş kirin. QAMIŞLO - ANHA

## Dagir dike û dîwar çêdike

Hêzên artêşa tirk a dagirker sînorê Rojava binpê dike û tevî avakirina dîwarê şermê, bi hezaran darên zeytûnan dibire.

Der barê mijarê de welatiyê bi navê Cefer Hacî diyar kir ku leşkerên tirk bi dagirkirina axa wan, dîroka wan hedef digire û wiha domand: "Gelek sivîl qetil kirin. Em bang li hêzên navdewletî dikin ku pêşiya vê zilmê bigirin."


Welatiyên bi navên Xeyriye Hikmet û Fatma Mihemed jî destnîşan kir ku artêşa tirk avahiyên wan dirûxîne, darên wan radike û dîwar ava dike.

*EFRÎN - ANHA*

## Di temenê biçûk de barê giran

Hesen Cefer li gel dapîr, bapîr û xaltîka xwe mezin bû û di temenekî biçûk de ket bin barekî giran. Ji ber cudabûna bav û dayika xwe ji mafê xwe yê xwendinê jî dibe.

Zarokê bi navê Hesen Cefer (11) ji gundê Hec Xelîl yê Raco ya Efrînê ye û niha li taxa Şêxmeqsûd a Helebê dimîne. Di yêksaliya Hesen de dayik û bavê wî ji ber pirsgirêkên malbatî ji hev cuda dibin. Piştre jî dayika wî di zewice diçe bakurê Kurdistanê û bavê wî jî di zewice û li Efrînê dimîne. Piştre jî dapîr, bapîr û xaltîka wî Leyla Horo li Hesen xwedî derdikevin.



Hesenê ku ji hembêza dayik û bavê xwe bêpar mayî her wiha ji ber rewşa şer a heyî jî ji mafê xwe yê xwendinê mahrûm dimîne. Xaltîka Horo bi çêkirina cil û bergan debara xwe dike û Hesen jî demek şûnde fêrî heman kar dibe. Hesenê ku bi vî karê xwe piştgiriya aborî dide malbatê bang li Rêxistinên Mafê Zarokan dike ku ji zarokên Şêxmeqsûd re bibin alîkar. *HELEB - ANHA*

www.anfvekurdi.org

# Mafê Ocalan tê binpêkirin

**Serokê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê Raimondi diyar kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li dijî Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê ye. Li Ewropayê kurd li dijî tecrîdê li ser piyan in**



Dewleta AKP'ê li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke giran dimeşîne û bi mehan e agahî ji Ocalan nayê wergirtin.

Serokê Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa (DMME) Guido Raimondi di daxuyaniya xwe ya çapemeniyê de bersiv da pirsa ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocelan ev 5 sal in bi parêzerên xwere hevdîtin nake û wiha got: "Ev rewş dijî Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê ku xala 34 bin pê dike."

Raimondi diyar kir ku nehiştina hevdîtina bi parêzeran re û astengkirina hevdîtinan madeya 34 ya Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê îxlal dike. Di daxuyaniya çapemeniyê de jî li ser êrîşên qirkirinê yên li ser Bakurê Kurdistanê û nerazîbûnên dijî vê rewşê, her wiha bêbersiv mayina serlêdanan ya ji bo Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ji anî rojevê.

**JI CDK-F'Ê BANG**

CDK-F, ji bo meşên li dijî tecrîda li ser Ocalan, banga tevlîbûnê kir. Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Fransayê (CDK-F) daxuyaniyeke nivîskî weşand û wiha got: "Di şexsê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de hewl didin gelê kurd bê tepisandin û tunekirin. Lê belê Rêber Apo bi gotina 'Li ku dibim bila bibim, bi hemû hebûna xwe ez ê derfetên berxwedanê û şoreşê bafirînin' hem komploya navneteweyî pûç kir, hem jî mîna ku got, li ber xwe da û bi perspektîfa îdeolojîk pêşî li gelê Kurd û Tevgera Azadiyê ya Kurd vekir."

Di dewama daxuyaniyê de hat ragihandin ku Ocalan bi paradîgmaya xwe re, ku li Şoreşa Rojava şênber bû, nîşan da bê çiqasî ji bo jiyana bi hev re ya gelan girîng e û hat gotin, "Ev paradîgmayê li Şengal û Rojava şênber bû. Dewleta Tirk a mêtinger a nekarî xwe li van destketiyên Kurdan û vê paradîgmayê rabigire, ji aliyekî ve Rojava dagir kir, li aliyê din tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd şidand û li dijî Rêberê Gelê Kurd dest bi êrîşên tunekirinê kir."

**BANGA BEŞDARIYÊ**

CDK-F ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan û azadiya Ocalan, bang li Kurdan û dostên wan kir ku tevlî meşên 28'ê çileyê bibin. ***PARÎS - ANF***

## Komeleyan serî li dadgehê da

Li Stenbolê komeleyên bi KHK'yên jimare 677 û 678'an hatin girtin, li Dadgeha Îdarî doz vekirin. Parêzerên OHP'î yên li ser navê komeleyan serlêdan kirin, dest nîşan kirin ku girtin li dijî Qanûna Bingehîn û huqûqê ne û xwestin biryar bê betalkirin.

Parêzeran di serlêdanê de balê kişand ser girtina komeleyan, desteserkirina malên wan û xwestin birêvebirina lêpirsînê bê betalkirin û daxwaz kirin ku, KHK'ya bûye sedema girtina komeleyan û li dijî Qanûna Bingehîn e, bê lêkolînkirin. Di doza betalkirinê de jî, dozbar Serokwezîrtî û Wezareta Karên Navxweyî hat nîşandan. Di serlêdanê de yeko yeko li ser komeleyan hat rawestandin.

Di serlêdanê de hat diyarkirin ku, girtina komeleyan li dijî Qanûna Bingehîn û huqûqê ye û hat derpêşkirin ku madeya 3'yemîn a KHK'ya jimare 677 ku bûye sedema girtina komeleyan, li dijî Qanûna Bingehîn e. Di serlêdanê de, daxuyaniya Komîsyona Venedîkê ya Konseya Ewropayê ya têkildarî KHK'yan jî cih girt. Her wiha hat diyarkirin ku, girtin li dijî Huqûqa Mafên Mirovan e. Di serlêdanê de hat daxwazkirin ku, divê têkildarî girtinan tazmînata madî û manewî jî bê dayîn. ***STENBOL***

## Qeyûm xwe li heywanan jî ranagire

Waliyê Wanê Îbrahîm Taşyapan, piştî weke qeyûm li Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê bi cih bû, Stargeha Jinan, Serokatiya Daîreya Polîtîkayên Jinan û Navenda Piştgiriya Perwerdeyê ya Şaredariyê girt.

Vê yekê têra qeyûm Taşyapan nekir û vê carê jî biryar da kulûbeyên li parkan ên ji aliyê Şaredariya DBP'yî ve ji bo heywanên li derve xwe lê xwedî bikin hatine çêkirin, rake. Ev kulûbe berî du salan ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê ve hatibûn çêkirin û şêniyên bajêr jî xwarin datanîn nava van kulûbeyan ji bo heywan bixwin. ***WAN - ANF***



# Nasnameya jinan tê darizandin

Rûniştina "Doza Sereke ya KCK'ê" ku 154 siyasetmedaren kurd ten darizandin li 2'emnîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin. Di rûniştina dozê de Midûrê berê yê DÎSKÎ Nadir Bîngol û Şaredarê Êlihê yê berê Necdet Atalay amade bûn.

Siyasetmedar û endama KJA'yê Sara Aktaş, jî ji Girtigeha Tîpa F-1 a Kandira bi rêya SEGBÎS'ê tev li rûniştina dozê bû. Li gel siyasetmedaran parêzer jî amade bûn. Ewil Nadir Bingol bi kurdî parastin kir. Bîngol, anî ziman ku wê demê DTP partiyek li gorî Qanûna Bingehîn hat avakirin, lê dozger DTP wekî partiya dijzagonî nîşan da û wiha got: "Ez vê yekê qebûl nakim. Çalakiyên ku ez tev lê nebûme wekî ku ez tevlê bûme nîşan dide. Hemû çalakiyên ku ez tev lê bûme ji aliyê partiya me û saziyên civakî ve hatine amadekirin û hemû li gorî pîvanan hatine kirin. Hemû sucdariya dozger ne di cih ê xwe de ne û ez sûcê li ser xwe qebûl nakim."

Endama KJA'yê jî bi kurdî parastin kir û anî ziman ku doz dubare dibe. Aktaş diyar kir ku di vê dozê de nasnameya jina kurd û kurd tên darizandin. Aktaş, anî ziman ku ji ber vê dozê tu sûcê wê tune, lê ji ber ku têr xizmeta çand, ziman û nasname û azadiya civaka xwe nekiriye sucdar e. ***AMED***



## Divê berxwedan bê geşkirin

**TEVGERA** Jinên Kurd li Rûsyayê (TJK-Rûsya) civîna xwe ya çaremîn a bi şiyara 'Her tişt ji bo Ocalan' li bajarê Saratovê lidar xist. Civîn li salona şano û sînemayê ya Karl Marx a li navçeya krasnîkûtê pêk hat.

Tevî kurdistaniyên li Krasnîkût û navçeyên derdorê dijîn, Serokê Parlamenta Herêma Saratovê Lûbov Zakora Alexsandrovna, Alîkara Serokê Organîzasyona Hindikahî û Gelan Lîdya Krasnova Sergyevna, siyasetmedar û nivîskar Alexsandr Zûev û gelek dostên Kurdan tevlî bûn. Parlamentera HDP'ê ya Rihayê Dîlek Ocalan balkişand ser tecrîdê û wiha got: "Fikarên me zêde dibin. Em nizanin bê li Îmraliyê çi diqewime. Divê berxwedan bê geşkirin." Dîlek Ocalan bêdengiya saziyên navneteweyî ya li pêşberî rewşê rexne kir û destnîşan kir, hêzên bêdeng dimînin, hevparê vî sûcê li dijî mirovahiyê ne. Nivîskar Alexsandr Zûev Pûlatovîç peyivî û diyar kir, ew piştgiriyê didin têkoşîna bi rûmet û mafdar a gelê kurd. **SARATOV - ANF**

### Ji bo wekîlan biryara girtinê

**AMED** - Der barê parlamenterên HDP'î yên Wanê Adem Geverî û Lezgîn Botan de ji aliyê 2'yemîn Dadgeha Cezaya Giran a Wanê ve biryara girtinê hat derxistin. Ji bilî biryara girtinê ya der barê parlementeran de "qedexeya derketina derveyî welat" û piştî îfadeyan şerta kotrloa edlî jî hat danîn. Hevserokên HDP'ê jî di nav de 11 paralamenterên HDP'î hê jî di girtîgehê de ne.

### Hevşaredar hatin girtin

**MÊRDÎN** - Dewleta AKP'ê li hemberî hevşaredaran operassyonan didomîne. Hevşaredarên navçeya Nisêbîn a Mêrdînê Sara Kaya û Cengîz Kok ku di 13'ê Çileyê de tevî 12 kesan hatibûn binçavkirin û 14 rojan di bin çavan de man, piştî karên îfadedayîna li muduriyeta polîsan sewqî dozgeriyê hatin kirin. Cengîz Kok û Sara Kaya bi îdiaya, "Yekitiya dewletê xerab kirine" hatin girtin.

### Qeyûm lêpirsîn da destpêkirin

**WAN** – 90 xebatkarên şaredariyê, ku binçavkirina Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Bekîr Kaya protesto kirin, ketin ber lêpirsînê. Piştî ku 2 meh di ser bûyerê re derbas bû, bi hinceta "Li ber qanûna xwepêşandan û civînê ya bi hejmara 2911 rabûne" lêpirsîn hat destpêkirin. Xebatkaran dan xuyakirin, ku wan mafê xwe yê protestoyî bi kar anîne û nerazîbûn nîşanî lêpirsînê dan.

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
28 Çile 2017 Şemî

# PDK xeta îxanetê bernade...

**PDK û AKP her du jî naxwazin felsefeya neteweya demokratîk bi pêş bikeve û ji bo xwe wek xetere dibînin. Ji bo vê jî di nav têkiliyeke qirêjî de ne û dixwazin bi şandina Pêşmergeyên Rojava li Rojava jî şerê birakujiyê bidin destpêkirin**

EKREM BEREKAT





Tevî têkçûna hemû siyasetên Hikumeta Başûrê Kurdistanê yên li dijî Rojava û sîstema girêdayî wê ya ku hemû pêkhateyan di hundirê xwe de dihewîne jî PDK di rêya xiyanetê de bi israr e û hevbendiya dewleta tirk û Barzanî jî li dar e da ku tevgera kurdistanî ya ku wek xetereyekê li ser dîktatoriya xwe dibînin, derbe bikin. Lê pirsa ku li vir derdikeve ev e; gelo dê ev yek bi encam bibe? Û bikaranîna gotinên komployî û îxanetî dê di cihê xwe de bin?

***Barzanî piştgiriyê dide***

Endamê Komîteya Navendî ya PDKS'ê Kawa Ezîzî got ku ew li ser damezirandina artêşeke bi nave Artêşa Kurdistana Sûriyeyê dixebitin ku hêzekê ji 15 hezar leşkerî bişînin Kurdistana Sûriyeyê (Rojava) û destnîşan kir ku hejmara qaşo Pêşmergeyên Roj gihaştiye 6 hezar û 700'an û li ser du hêzan hatine dabeşkirin û di nava xebatê de ne ku hêzeke din li ser wan zêde bikin. Her wiha diyar kir ku serokê hikumeta Başûr Mesûd Barzanî piştgiriya vî karî dike.

Heke hejmara Pêşmergeyên Roj ev be, wê demê 8 hezar leşkerên din ji ku hatin, ji bilî ku li gorî jêderên ji hundirê endamên pêşmergeyan ku hejmara wan nagihîje 2 hezar kesî.

***Gotinên Yildirim û helwesta Barzanî***

Ger em hinekî vegerin serî em ê bibînin ku piştî hevdîtinên dawîn ên ku di navbeyna nûnerên dewleta tirk û malbata Barzanî de li Başûr çêbûbûn û her wiha daxuyaniyên serokwezîrê Tirkiyeyê Binalî Yildirim ên ku di hembêza Barzanî de nîşan da û HPG, YPG û HSD'ê bi terorê bi nav kir, ev hêzên ku tevahiya cîhanê ji wan re dibin şahid ku wan di bakurê Sûriyeyê û Şengalê de berevanî di ber mirovahiyê de kir û parastina wê jî kirin û li hemberî mezintirîn rêxistina terorîstan ango DAIŞ'ê di cîhanê de sekinîn û di hemû eniyên şer li Şengal, Kerkûk û Rojava de têk birin.

Piştî wê yekser Nêçîrvan Barzanî di platformeke gotûbêjkirinê de daxuyanî da û Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) bi navê terorê û dîktatoriyê tawanbar kir.

***Îstîxbarata Tirkiyeyê bi rê ve dibe***

Daxuyaniyên Erdogan ên ku di dema serdana Barzanî ya 10'ê kanûna 2015'an de ji Tirkiyeyê re dabû, teqez kiribû ku dê şerê PKK'ê li Başûr û tevahiya Kurdistanê bike. Her wiha di 22'yê mijdara 2014'an de serokwezîrê Tirkiyeyê yê berê Davutoglu jî serdana Pêşmergeyên Roj kir. Wê demê em ê bizanin bê ka ew 8 hezar leşkerên ku Kawa Ezîzî qal dikir, kî ne. Pêşmergeyên ku qala wan tê kirin girêdayî PDK'ê ne û li ber destê îstîxbaratên tirkî hatine perwerdekirin û di nav wan de jî endamên îstîxbaratên tirkî bi xwe hene.

***Artêşa tirk li Babê têk diçe***

Di daxuyaniyên Kawa Ezîzî de jî xuya dike ku PDK amadekariya komployeke nû dike û hewldanên wê jî hene ku dixwaze tevliheviyê di navbera herêmên rojavayê Kurdistanê de derxe. Her wiha bingehekê jî bo şerê birakujiyê di navbera kurdan de biafirîne. Ev yek bi piştgiriya Tirkiyeyê ya ku herî dawî li Babê pir mezin têk çû û morala leşkerên wê şikest, pêk tê. Li gorî hin çavkaniyên taybet ji hundirê Cerablusê, çeteyên girêdayî Tirkiyeyê derketina ji Cerablus û Raiyê red kiriye ji ber ku plana Tirkiyeyê ew bû ku çete berê xwe bidin bajêr û ew bi xwe di bajaran de bimînin. Her wiha dê desthilatdariya xwe tê de xurt bikira û yên ji bedela artêşa wan şer bike jî çete bûna û ev yek jî aliyekî mijarê yê din e.

***Tevî hemû hewldanan jî têk çûn***

Li aliyê din jî dewleta tirk dixwaze destkeftiyên Rojava bi rêya derxistina diyardeya birakujiyê di navbera kurdan de derbe bike. Ji ber ku jî destpêka pêşxistina çirûska şoreşa Rojava, tevî hemû alîkariya Tirkiyeyê ya ji bo komên çeteyan ku êrîşî rojavayê Kurdistanê dikir jî ev komên çete ji Efrînê heta Til Koçerê yek bi yek têk çûn.



***Armanca AKP'ê çi ye?***

Her wiha Tirkiye bi rêya vê gavê dixwaze Rojava jî mîna Başûr bixe bin kontrola xwe û hikumeta herêmê li gorî berjwendiyên xwe bimeşîne. Ji ber ku AKP û PDK her du jî ji belavbûna felsefeya neteweya demokratîk ditirsin, dixwazin projeya federaliyê têk biçe. Helwesta hêzên demokratîk û piraniya partî û rêxistinên Rojava di vê derbarê de zelal e û herî dawî endamê Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Aldar Xelîl diyar kiribû ku rojevkirina PDK'ê ji meseleya şandina komeke çekdar a bi navê 'Artêşa Kurdistana Sûriyeyê' li xwe dikin, gaveke xeternak e ber bi şerê birakujiyê ve.

Di nêrîna min de tevî ne berpirsyariya kesên ku ev daxuyanî da, em hîn dibin ku ev gav di çarçoveya planên hevbendiya Tirkiye û Barzanî de ye û dixwazin tevgera kurdistanî ya ku ji xwe re wek xetere dibînin, têk bibin. Em jî li vir dipirsin; gelo mimkun e ku ev gav encamgir be?

***Divê li dijî vê planê hişyar bin***

Ez texmîn dikim ku dê ew tenê wekî hewldaneke qirêjî bimîne ku ew dijminatiya tevgera kurdistanî dike û naxwaze statuyek ava bibe û van destkeftiyan birûxîne. Lê dîsa jî divê ev plan hêzekê bide me û xebata xwe bêhtir bikin ji ber ku dijminên gel hîn jî li dijî me di nav hewldanan de ne. Tevî ku gelek caran bi bin ketine û li vir bikaranîna têgehên xiyanet û komployê wê di cihê xwe de be.

# Helwesta kurdan a li dijî kirinên desthilatdariyê

SALIH CUMA PÎR

Taybetmendiyeke mêtingeriya tevkujer ew e ku civaka bindest biçûk dibîne û tinazê xwe bi aqilê wê dike. Dewleta tirk kurdan naxe dewsa însanan. Lê belê li cîhanê gelekî din mîna kurdan polîtîk tune ye. Bi taybetî jî bi têkoşîna ku di deh salan dawîn de meşand gihaşt asta gelekî ku zanebûna wî zêde bûye. Şerê taybet û psîkolojîk ê li ser kurdan hate meşandin, bû sedem ku bibin xwedî ezmûn û zanyariyeke pak.

Desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê piştî ku bajarên kurdan rûxandin û şewitandin, niha bi gotinên "Em ê ji bo we avahiyên baş çêkin" henekên xwe bi kurdan dike. Bajarekî mîna Sûrê ku ruhê Amed û kurdayetiyê temsîl dike, hate rûxandin û şewitandin, paşê jî dibêjin "Em ê ji we re Toledoyan ava bikin" û henekên xwe bi kurdan dikin. Esas pêşî difikirîn ku dewsa tax û wargehên nû yên werin avakirin kampên tevkujiyê qereqolan çêkin. Binavkirina kampên tevkujiyê ya mîna avahiyên modern di dema moderniteya kapîtalîst de di tevkujiyê re derbaskirina gelek gel û çandan tîne bîra me. Jixwe Komara Tirkiyeyê di tevahiya dîroka xwe de bi navê birina medeniyetê ya Kurdistanê tevkujî pêk aniye. Kurd tim mîna civakeke ku divê bên terbiyekirin û tirkkirin hatine nîşandan. Tevî ku ji aliyê civakîbûyîn, maf, dad, nirxên mirovahiyê û gelek aliyên din ve ji civaka tirk pêşketîtir in jî tim mîna ku kevneperest in, hatine nîşandan. Bi vê yekê re xwestine ku kurd ji rastiya xwe ya civakî qut bibin û meyla xwe bidin tirkbûnê. Her tim pêşketin û medenîbûn mîna tirkkirinê hatiye nîşandan. Niha jî hewldana avakirina goran bi navê din avahiyên modern, dixwazin tevkujiyê bi kurdan bidin bawerkirin. Wê kurdan bixin van kampan û tevkujiyê bimeşînin û bi vê yekê re wan bixin pêvajoya tirkbûnê. Bêgûman kurd zane ne, dizanin ku ev avahiyên nû, ev wargehên TOKÎ'yê kampên tevkujiyê ne.

Desthilatdariya AKP'ê henekên xwe bi aqilê gelê Amedê dike. Êrîşê dibe ser qadên ku gelê Amedê herî zêde nirxê pê dide. Di rastiyê de ev êrîşa şikandina îradeyê ye. Li dewsa ku hebûna Baxçeyên Hewselê were teşwîqkirin, niha dixwazin ji holê rakin û ji rantxuran re pêşkêş bikin. Bi vê jî dixwazin hevkarên xwe yên nû di nav kurdan de ava bikin. Hevkarî dê li ser bazarkirina nirxên kurdan bi pêş bikeve. Baxçeyên Hewselê bi aliyekî xwe mîna kezeba gelê Amedê ne. Cihên ku gel lê nefesê distîne. Lê belê ev der di bin navê modernbûnê de dê bi betonê were kuştin. Hesabên rantê yên li ser Baxçeyên Hewselê tunekirina ekolojiyê bi xwe re tîne.

Bi vî şêwazî jiholêrakirina Sûr û Baxçeyên Hewselê tê wateya êrîşa li ser gelê Amedê. Ev kirinên ku erêkirina gelê Amedê nayê standin jî divê mîna êrîşeke mêtingeriya tevkujer were dîtin. Çawa ku hevserokên şaredariyan û parlementer tên girtin û bi vê yekê îradeya gel tune tê hesibandin û tê şikandin, bêyî destûra gel bi betonê dagirtina qadên herî xweş ên Amedê jî êrîşeke li dij îradeya gel e. Ji ber vê yekê divê gel bi zanîna amedîbûnê li dijî van êrîşên li ser Sûr û Hewselê derkeve. Lêkirina kampên tevkujiyê û tunekirinên ekolojîk divê mîna tiştekî asayî neyên dîtin. Divê têgihiştina ku bibêjin tiştê em bixwazin em dikarin bikin û gelê Amedê dê bê deng bimîne, ji holê were rakirin. Di rewşên wisa de divê karakter û ruhê berxwedêr ê Amedê bînin bîra mêtingeran. Gelê Amedê di 40 salên dawîn de tu caran serî li dijî êrîşên hêzên mêtinger û tevkujer netewand. Amedê di her derfetê de ruhê serhildêr ê azadîxwaz raxistiye ber çavan.

Serokwezîr niha jî qala afirandina navendên cazîbeyê dike. Ev paketa ku şaredarê berê yê Amedê Osman Baydemir mîna kundirê vala bi nav kir û her sal çend ji van paketan hatin vekirin. Ji bo xapandina gelê kurd, dûrxistina ji daxwaza nasnameya neteweyî û demokratîk a kurd van paketan tînin rojevê. Lê belê yek ji van paketan jî xizmeta rêveberên şerê taybet nekir. Ji ber vê yekê jî êdî zikê gelê kurd ji paketên bi vî rengî û navendên cazîbeyê têr e. Diyar e ku ji bo hin hevkarên xwe dê derfetan pêşkêş bikin. Ji ber ku li Kurdistanê gelekî teşhîr bûye û nikare li ser pêyan bisekine.

Serokwezîrê dawîn ji bo ku kurdan bixapîne tim qala paketan, teşwîqan, navendên cazîbeyê dike. Dibêje min bi vê nexapand, ka bi ya din bixapînim. Bi vê yekê re jî rûyê xwe yê zalim, tevkujer dixwaze veşêre. Desthilatdariya AKP-MHP'ê êdî bi devê xwe çivîkan jî bigire êdî li Kurdistanê bawerî pê nayê anîn û wê nikare gel bixapîne.

Daxwazeke bi tenê ya kurdan heye, ew jî demokrasî û azadî ye. Demokratîkbûna Tirkiyeyê û çareseriya pirsgirêka kurd e. Dema ev yek pêk hat dê pirsgirêkên betaliyê yên li Kurdistanê jî, pirsgirêkên aborî, pirsgirêkên xizmetê, pirsgirêkên avahiyan jî çareser bibin. Roja ku demokratîkbûn û çareseriya pirsgirêka kurd pêk hat wê demê dê kurd mîna civak û mirov li ber çavan werin girtin. Heta ev yek pêk neyê wateya tiştekî din tune ye. Her wiha tê zanîn ku ji bo kurdan di tevkujiyê re derbas bikin tu tişt texsîr nakin.

Ji ber vê yekê jî mîna paketên berê yên kurdan eleqedar nakin, navendên cazîbeyê yên henekên xwe bi aqilê kurdan dikin dê nebin rojeva kurdan. Ji bo kurdan a niha di rojevê de bilindkirina têkoşîna li dij desthilatdariya AKP-MHP'ê ye. Di vê kêliyê de ji paşvexistina desthilatdariya AKP-MHP'ê û li ser heman bingehî avakirina demokratîkbûnê pê de tu rojeveke kurdan tune ye. Ji ber vê yekê jî hewldanên berovajîkirina rojevê yên desthilatdariya AKP-MHP'ê dê encamê negirin.

Ji bo gelê kurd tecrîda li ser Rêberê wê rojev e. Di 8'ê adarê û Newrozê de xwedîderketina li nirxên xwe yên neteweyî û demokratîk rojev e. Di referandûmê de li dijî êrîşan û zilma ku desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê di sal û nîva borî de meşand helwesta ku kurd nîşan bidin rojev e. Divê kurd referandûmê mîna derfeta nîşandana helwesta kurd bibînin. Helwesta kurd jî di asta herî bilind de bi şêwaza "NA" dê were nîşandan.

www.arsivakurdi.org

## Li Çînê Mîhrîcana Berf û Qeşayê

**GELEK CIVAKÊN LI** welatên Ewropa, Asya, Rojhilata Navîn, Balkanan û Amerîkayê dijîn, xwedî çandên qedîm in. Di nava salê de gelek caran tên gel hev, şahî û mîhrîcanên rengîn pêk tînin. Çawa di 21'ê Adarê de Newroz ji bo gelên Rojhilata Navîn û bi taybetî kurdan girîng be, Mîhrîcana Berf û Qeşayê jî ji bo çîniyan girîng e. Mîhrîcana Berf û Qeşayê her sal ji 5'ê çileyê heta 5'ê sibatê mehekê didome. Mîhrîcan ji sala 1985'an vir her sal tê lidarxistin. Gel li derve peykerên ji qeşayê çêdike û derve dibe muzeyeke servekirî. Lê ji derveyî vê, gelek şahiyên cuda jî tên lidarxistin. Wek mînak; li çiyayê Yabu kaşûnê û di çemê Songhuayê de jî avjeniyê dikin û li Baxçeyên Zhaolinê pêşengeha çirayên qeşayî tê vekirin. **PEKÎN**



# Arzela hat girtin lê xebat didomin

**Komeleya Çand û Hunerê ya Arzela ku bi biryara KHK'ê hat girtin, niha li avahiya HDP'ê ya Bahçelîevlerê ya Stenbolê xebatên xwe yên çand û hunerê berdewam dike**



Di serdema hikumeta AKP/Erdogan de li dijî civakê derbeyên mezin pêk hatin, mirov li kuçeyan hatin qetilkirin, bajar hatin rûxandin, bi hezaran kes hatin girtin û deriyê bi sedan saziyên civakî bi awayekî dijhiqûqî hatin girtin. Li gel van saziyan Komeleya Çand û Hunerê ya Arzela jî bi biryara KHK'ê ya 22'yê mijdarê hat girtin. Piştî Komeleya Çand û Hunerê ya Arzela hat girtin, rêveberiya Navenda Arzelayê li avahiya HDP'ê ya navçeya Bahçelîevlerê ya Stenbolê dest bi xebatên xwe kir.

Piştî sazî hat mohrkirin, serokê komeleya Arzelayê Abdulhakim Sarsilmaz jî hat binçavkirin û di 3'yê çileyê de hat berdan.



Sarsilmaz diyar kir ku navenda wan di salên 1990-91'an de di bin banê Navenda Çandê ya Mezopotamya (NÇM) de wek Med û Arzela xebatên xwe meşandin. Sarsilmaz anî ziman ku xebatên çand û ziman li her derê tên meşandin û wiha got: "Heke civakek ziman û çanda wî hatibe tunekirin, wê demê ew netew dimire. Em ê jî li her derê xwedî li çand û hebûna xwe derkevin."

**'TRT ŞAŞ' VEKIRIN**

Sarsilmaz bal kişand ser TRT Kurdiyê ku gelê kurd wek 'TRT Şaş' bi nav dike jî û wiha got: "Dewlet li aliyekî kanalên çand, huner û ziman vedike. Li aliyê din saziyên din ên çand, huner û ziman digire. Li vir nakokî heye. Her ku xebatên çand û ziman hebe divê her dem û li her derê hebe. Ev zext ne tenê li dijî çand û hunerê ye. Li dijî her kesî ye. 5 meh berê li Esenyurtê 12 kesên bi kurdî stran gotin rastî tundiyê û lêdanê hatin. Li Komeleya Çand û Hunerê ya Arzelayê xwendekaran perwerdeya gîtar, erbane û hwd. didît. Kursiyerên me yên li komeleya Arzela perwerde didît niha xebatên xwe berdewam dikin."

Şagirta erbanê Bêrîvan Onen diyar kir ku herî zêde erbane çanda wan dide xuyakirin û ev tişt got: "Demeke dirêj e ez difikirim bêm kursa erbaneyê. Herî dawî ez hatim Arzelayê. Ji meha îlonê heta niha li Arzelayê kursê dibînim. Li vir dost û hevalên min çêbûn. Ez baş fêrî kurdî bûm. Min bêtir çand û zimanê xwe nas kir."

**NE DEMA REVÊ YE**

Rêvebera Arzelayê Aliye Kurt jî anî ziman ku her çend saziya wan hatibe mohrkirin jî dê bêtir li çand û zimanê xwe xwedî derkevin. Kurt da zanîn ku niha li avahiya HDP'ê ya Bahçelîevlerê xebatên xwe berdewam dikin.

Şagirtan aşkera kir ku dem ne dema revê, ya berxwedanê ye. ***STENBOL - DÎHABER***



## Li Rojava koma merasîman

Li Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê di her qadê de pêşketinên dîrokî pêk tên û ji perwerdeyên leşkerî û parastinê bigire heta avakirina komun û meclisan, ji saziyên civakî bigire heta komên muzîkê, di her warî de pêşketinên dîrokî xwe didin der. Komeke ciwanan a ji 20 kesan pêk tê, piştî xebata 5 mehan bi piştgiriya Desteya Parastinê, komeke muzîkê ava kir. Dê kom beşdarî mîhrîcan û merasîmên şehîdan û yên leşkerî bibe.

Ciwanan da zanîn ku armanca wan a avakirina komê ew e ku di merasîmên leşkerî de disiplînekê bidin avakirin. Komê li Goristana Şehîd Refîq a gundê Metîna yê girêdayî navçeya Şera, yekemîn pêşkêşiya xwe pêk anî.

Berpirsê komê Mihemed Hebeş aşkera kir ku endamên komê li ser amûrên muzîkê yên wekî tembûr, trumpet, barton, tînor, senbal û hwd. li Navenda Çand û Hunerê ya bajarê Efrînê perwerde dîtiye. Hebeş got ku wan di peydakirina alavan de gelek zehmetî kişandin û piştrast kir ku di vî milî de TEV-ÇAND'ê gelek alîkarî daye wan. Tê payîn ku koma muzîkê 29'ê çileyê di şahiya pîrozbahiya 3'yemîn salvegera ragihandina rêveberiya xweser de, hunera xwe pêşkêşî gel bike. ***EFRÎN - ANHA***

# Di sala 1944'an de Pîremêrd ava kiriye

RÊZAN MIHEMED / SILÊMANÎ - ROJNEWS

Pirtûkxaneya Giştî ya Silêmaniyê di sala 1944'an de ji hêla helbestvan Pîremêrd ve li bajarê Silêmaniyê hatiye vekirin. Niha ev pirtûkxane yek ji pirtûkxaneyên herî dewlemend ên başûrê Kurdistan û Iraqê ye. Zêdetirî 120 hezar çavkaniyên bi zimanên kurdî, erebî, farisî û îngilizî tê de hene.



Rêveberê pirtûkxaneyê Alan Reûf der barê pirtûkxaneyê de axivî. Reûf got ku pirtûkxaneya gel ji beşên zarok, tomarkirin, çavkaniyên kurdî, erebî, farisî û îngilizî, beşên înternet, lêkolîn, salona semîner û hinek beşên din û beşa rêveberiyê pêk tê.

Reûf aşkera kir ku kesên tên serdana wan li gorî werzan diguherin û ev tişt got: "Rojê bi qasî 50-80 welatî tên serdana me. Tenê di sala 2016'an de zêdetirî 11 hezar kes hatin serdana pirtûkxaneyê. Li gel vê, gelek semîner û xebatên cuda pêk hatin. Di sala 2016'an de me nêzî 25-30 çalakî pêk anîne û me mîhrîcana herî mezin a pirtûkan li dar xist. Em ê îsal jî di meha nîsanê de mîhrîcana duyemîn a pirtûkan di roja pirtûkan a cîhanê de li dar bixin."

Reûf di dawiya axaftina xwe de ji hikumetê daxwaza piştgiriyê kir û wiha pê de çû: "Pergala elektronîk ji bo pirtûkxaneyê hatiye danîn. Niha xebatên daxilkirina 120 hezar çavkaniyan tê kirin. Komputer hatine danîn û dê kesên bên serdanê bi rihetî xwe bigihînin çavkaniyên lêkolînê."

Berpirsa pirtûkxaneyê Awaz Heme Ferec ji zanîn ku xwendekarên seretayî, navîn, peymangeh û zanîngehê tên serdana wan. Rêvebera pirtûkxaneyê Gulistan Seîd jî destnîşan kir ku zarok dikarin her dem bên pirtûkxaneyê û wiha axivî: "Pirtûk bi çar zimanên sereke kurdî, erebî, farisî û îngilizî ne, zarok dikarin hem li vir bixwînin hem jî bibin mal."

Gulistanê piştrast kir ku ji derveyî pirtûkxaneyê, du salonên wan hene ku dikarin li wir civîn werin çêkirin û fîlm jî bên temaşekirin. Fîlm rojên yekşem û sêşemê tên nîşandan.

## 'Çirûskek Ji Berxwedana Kobanê'

NAZDAR EBDÎ / QAMIŞLO - ANHA

Akademiya Şehîd Viyan Amara ya Kobanê pirtûka 'Çirûskek Ji Berxwedana Kobanê' li weşanên xwe zêde kir û dê di demeke kurt de li ber destê xwendevanan be. Pirtûk bi boneya duyemîn salvegera serkeftina berxwedana Kobanê ji aliyê komeke nivîskarên Kobanê ve hatibû amadekirin.

Pirtûk bi rêbaza çîrokan hatiye nivîsîn. Ew êşa gelê Kobanê, dayika ku li ser sînorê Bakur û Kobanê êşa koçberiyê kişand, zarokên ku hîna ji dayik nebûne û dev ji axa xwe berneda û gelek bûyerên din hatiye nivîsandin

Dîsa serpêhatiyên gelek qehremanên wekî Cûdî, Nazlican, Sozdar, Ferhad, Arîn, Rêvana, Gîvara, Rustem, Denîz û Mehmûd jî di vê pirtûkê de tên vegotin. Ev qehremanên ku navên wan hat gotin, şahidên pêşeng ên berxwedanê bûn û dê bi çîrokên van şehîdan berxwedan ji bîra gel neçe.

Yek ji nivîskarên pirtûkê Aras Hiso der barê pirtûkê de diyar kir ku her çi qas kêm be jî, gelek tiştên veşartî di nava kolan, kuçe û birînên vî bajarî de veşartî bûn û wan xwest çirûskeke ronahiya vî bajarî derxin holê. Pirtûk ji hêla Ednan Hesen, Heysem Mislim, Cîhan Hesen, Selah Mislim, Aras Hiso, Mehrîvan Beyro, Sozdar Mehmûd, Rodîn Mihîdîn, Zîlan Hemo, Ridwan Deharo, Helîm Yûsif û Munîr Şêxî ve hatiye amadekirin.



# Serkewtişê Îdeolojîyî Xoverdayîşê KOBANÊ

HUSEYÎN ALÎ

Emser serrgêra 2. ya serkewtişê Xoverdayîşê Kobanê yo. Tarîxê şarê kurdî de xoverdayîşo tewr gird Kobanê de ameyo nîşandayîş. Kobanê de bi aşman taxe bi taxe, ziqaq bi ziqaq, keye bi keye û hetta ode bi ode çeteyê faşîstî ameyî têkberdiş. Heta aye roje, wexto ke dewletî nameyê DAIŞî eşnawitênê remayênê, Kobanê de zî her çiqas ke teknîko ke destê çeteyan de hende averşîyaye bî zî, vera şerwananê fedaîyan de binkewtî. Destpêka binkewtiş û têkşîyayîşê çeteyan Xoverdayîşê Kobanê de destpêkerde. DAIŞî şerwananê xo yê tewr qewetinan Kobanê de vînî kerdo. Têkşîyayîşo ke vera Xoverdayîşê Kobanê de bî, îradeya DAIŞî şikna.

**Kam ke biwazo vera DAIŞî de ser bikewo, ganî bibo wayîrê erjê sey seyyewbînanî, wijdan, edalet, heq û azadî yê ke Tevgerê Azadî de esto. Reyna ganî nê hêzê Tevgerê Azadîya Kurdî bigiro hetê xo. Neke bi hêzê sîleh û teknîkî nêşîno qezenç bikero**

Serkewtişê Xoverdayîşê Kobanê raştîya xo de serkewtişê îdeolojî û zîhnîyeto sîyasî yo. Çar parçeyê Kurdistanî de heme kurdî û merdimîye û hêzê demokratîke zî piştî dayî Xoverdayîşê Kobanê, Serhildanê ke seba piştîdayîşê Xoverdayîşê Kobanê 6,7 û 8ê teşrîna verêne de virazîyayî û heme cayan de weriştişê ser lingan yê hêzê demokratîkan bîyî sebeb ke Xoverdayîşê Kobanê ser bikewo. Xoverdakarê Kobanê hêzo ke xeta polîtîk û îdeolojîkî ra girewtî, DAIŞî têk berdî. DAIŞ Kobanê de hetê îdeolojîk û zîhnîyetî de têk şîyo. Waştişê azadî û zanayîşê demokratîke mezgê radîkalî û xeta ci yê întîxarî pelçiqna. DAIŞo ke her kesî tersnayêne û remnayêne, vera xeta demokrasî û azadî de mecbûr mend ke biremo. Xora DAIŞ kura de bi Tevgerê Azadîya Kurd reyde rî bi rî mendo, ewja de têk şîyo. Eke bi rayîrê hêzanê bînan asteng nêbîyêne, nika Bab zî kewtbî destê Hêzê Sûrîyeya Demokratîke ke YPG zî tede ca gêno.

Xoverdayîşê Kobanê nîşan dayo ke eke tevgerêk piştîya şar û merdimîye bigiro, têk nêşono. Tayyîp Erdoganî ke vatbî 'Kobanê ver bi kewtişî de ya' bi serewedaritişê 6,7 û 8ê teşrîna verêne ya Kobanê de ame duştê vînîkerdişê îqtîdarê xo. O wext Erdogan şîbî lingê Rayberê Şarê Kurdî û Tevgerê Azadîya Kurd û bi no hawa îqtîdarê xo xelisnabî. Sere de Wezîre Karê Zereyî û heme wezîrê hukmatê AKPyî o wext parlamenterê HDPyî ra lave kerdbî ke wa çalakîyan bivindarnî. Çimkî bi serewedaritişê 6,7 û 8ê teşrîna verêne de zafê bajar û qezayan kewtbî destê ciwanan.

Çimeyanê hêzê Xoverdayîşê Kobanê ra yewe zî çalakîyê ke bi deshezeran merdiman sînorê Pirsûsî ser de seba piştîdayîşê Kobanê kerdêne, bî. Heme hêzê demokratîke, hêzê çep û sosyalîst, rêxistinê kede, rêxistinê ciwan û cinîyan, reyna elewî, suryanî, çerkes, ermenî û sewbîna xeylê şar û bawerîyî beşdarê çalakiyan bîyî. Bi seyan ciwanan mergî girewtî çimê xo û sînorê Pirsûsî derbaz kerdî û beşdarê Xoverdayîşê Kobanê bîyî û şehîd kewtî. Sînorê Pirsûs û Kobanê bîbî warê piştîdayîşê Kobanê. Şarê Pirsûsî bi deshezaran merdiman kerdî meyman û bi no hawa derbazî tarîx bîyî. No prosesê xoverdayîşî de Pirsûs û Riha xo newe ra xelq kerdî. Zerrîya şarê Vakurê Kurdistanî seba Xoverdayîşê Kobanê dabî piro. Serewedaritişê şarî Xoverdayîşê Kobanê resna serkewtiş û pîvanê azadî, demokrasî û welatperwerîya şarê kurdî resna duştêko newe.





Fedaîyê sey Arîn Mîrkane, Dîyar Bagok, Destane, Vîyane û sewbîna yê Kobanê estî. Qehremanê ke vanî 'Yew Apocî heta guleyê xo yo peyên meterîsê xo nêverdano' estî. No ruh xora bin nêkeweno û do nika ra pey zî bin nêkewo. Serkewtiş zî, binkewtiş zî bi îdeolojî beno. Nizdîyê hezar şehîd û çend hezar zî gazîyê Kobanê estî. DAIŞ vera nê kesê ke bawerîya înan xeylê zaf o de binkewt.

Nika xeylê dewlete û hêzê sîyasî vera DAIŞî de cesaretê şerkerdişî qezenç kerdo. Hetta Tirkîyaya ke bi serran o ke DAIŞî miqate kena, vana ez DAIŞî reyde şer kena. Ganî ma bizanî ke DAIŞ tena bi hêzê leşkerî têk nêşono, ancax îdeolojî û zîhnîyetêko sîyasî yê qewetin eşkeno DAIŞî têk bişêro. Yê ke têkşîyayîşê DAIŞî yê vera hêzê demokratîkan de ra biewnîyo û vajo ma zî eşkenî DAIŞî têk bişêrî, mîyanê şaşî de yî. Eke xetêka azadîwaştox û demokratîk çinêbî, DAIŞ bi hêzê şerî û teknîkî reyde têk nêşono. Eke Şorişgerê Rojawanî û Tevgerê Azadîya Kurd şîna DAIŞî têk bişêrî, no saya xeta îdeolojîkî ya PKK û Şorişê Rojawanî de yo.

Eke Şorişgerê Rojawanî û PKK nêbîyêne nika DAIŞî Sûrîye, Îraq û Başûrê Kurdistanî bi temamî dekerdbî bin kontrolê xo. DAIŞ pêlêko winasî bî ke ti hêz vera ci de nêşînayêne bivindero. Ancax wexto ke xeta sîyasî û îdelojîk ya Rayberê Şarê Kurdî vejîyaye, o wext efsûnê ci xira bî. Fikrê radîkalî yê DAIŞî ke xo zaf qewetin hîs kerdêne, wexto ke îdeolojîyo ke heme heq, edalet û wijdanê merdimîye pê ameyo reyde rî bi rî mend, têk şî.

Kam ke biwazo vera DAIŞî de ser bikewo, ganî bibo wayîrê erjê sey seyyewbînanî, wijdan, edalet, heq û azadî yê ke Tevgerê Azadî de esto. Reyna ganî nê hêzê Tevgerê Azadîya Kurdî bigiro hetê xo. Neke bi hêzê sîleh û teknîkî nêşîno qezenç bikero.



## Sûrela

### Verra koletî omedê xeleşiyayişî

# Kobanê



Meral Kuçuk

Saya têkoşînê qehramanan de şarê kurd hata ewro ame. Saya vinitisê înan de ewro qalê kurd û kirmancî beno. Ewro saya xeleşiyayişî Kobanê de sarê ma berz o.

Rozanê sifte yê hêrişan bî. Şindor ser o qom amene têhet. Tayîne verê xo dayî vakûr. Tayîne ke nêwastene hardê xo caverderî. Werte mîletî ra jû genc, destê xo fîtînê hawa û vengdine; "Kobanê wela ma wa, Kobanê rûmeta ma wa, meşerê, îta de vinderê, ma verra tariyê înan naca ra roşte vila kemê. Ewro roze roza piya vinitis, piya xo ver estena ya." Roz bi roze herîşî bîyî giran. Her roz neweyî ciya ciya amene.

****

Hama çiyo en muhîm, Kobanê de kam ci xoverdayîş ser o qesey kerdenê, qerariyade pîlî ardenê zon. Werte honde ceng de bêawe, bêhewn vengê înan de omed estbî, qerariye estbî. Asme şi asme ser, Kobanê bi royê seferberiya çeney û lazekanê qehramanan xeleşiye. Koletiye Kobanê de kerd vîndî. Zerrîya her kesî de hem wayis hem kî berbayis estbî. Hetêde bi seyan gencî canê xo kerde werte, hetêde kî dîna tekoşîna kurdan dî, seserra 21. biyê tarixê xoverdayişî yê kurdan.

****

Devadeva di-hîre rozan ra tepiya şar hetê vakûr ra herîkiya şîndor. Verra pêro zorvajiye uca ra nêşiyayî. Kokiman ra hata domanan canê xo ra jû des mûnûtî. Vengê xo resnenê kuçeyanê, meterîsanê Kobanê.

Pêrone dî eke kurdî waste, eke şaranê bindestan biwazê, bêrê têhet çitûr kunê ser.

Iyê ke her tim qalê qedinayena kurdan kenê, iyê ke hewnê tertele-yî, hewnê teslîm guretene kenê, Kobanê de kerdê vîndî, xeleşiyayişê Kobanê ya piya, îradeyê şoreşgeranê seserra 21. dî, reyna namê înan tarix rê şiya ame nûsnayene. Kobanê ra teyna verra wehşetê çeteyan nê, verra pêro qûwetanê kolonyalîstan vengê şaranê bindestan bî berz.

****

Iyê ke wastenê omedanê serbestiye yê şaran werte ra wedarnî, sernêkewtî. Pêro planê kolonyalîstan qirika înan de mendî. Kobanê bi namê destanî, bi namê xo ver estene, bi namê rûmete.

Pelga newe tarîx de ame rakerdene. Demê herîşanê sifte de o genco ke o dem kultur rê gurene omedê çimê ci bî roştê Kurdistan sero axme bî. Xoverdayişê Kobanê verra ters xoverdayişê qûweta serkewtine bî.

****

Roz bi roz werte xanûxiraveyanê Kobanê ra geweyî wûsar bî pîl, bawerî, omed vila bî. Pêro armanca teslîmguretena kurdan bi tililiyanê xoverdayoxan tol ame vetene. Vatisê 'Kobanê niginena war' pêro zerrîyan de piya est. Zerrîya bi hazaran cenî, camerd, genc piya serva azadiye Kobanê est.

Ewro iyê ke dûstê faşîzme de qalê teng biyayene kenê, Kobanê biyare xo vîrî.

Omedê xo pîl bikerê, bi royê destanê Kobanê serva azadiye, serva demokrasî, serva têdûstiye bierze xover. Gam bi game verra kolonyalîzme, verra faşîzme adirê xeleşiyayişê wekerî. Xora vernîya ma wûsar o.

www.arsivakurdi.org

Rojeva Medya
28 Çele 2017 Şeme

# Travmayêka girane cuyenî

**Baroya Edene de Serekê Komîsyonê Hepisxaneyan Avûkat Tugay Bekî derheqê şewato ke Hepisxaneyê Edene de vejîya û netîceyê ci de 2 domanî merdî û 3 domanî zî birîndar bîyî de qisey kerd û wina va: "Domanî travmayêko cîdî cuyenî"**



18ê çileyî de domanê ke Hepisxaneyê Tîpa E yê Edene de koguşê domanan de mendêne, nivînanê xo veşnaybî û netîceyê şewatî de domanê bi nameyê Muhammed Erdogan û Ferhat Kayayî merdbî, 1ê xo bi hawayo giran 3 domanî û 5 karmendê hepisxaneyî zî birîndar bîbî. Serdozgerîya Komare ya Edene derheqê şewatî de tehqîqat daya destpêkerdiş. Çarçeweya tehqîqatî de heta nika îfadeyê 3 domanan û karmendanê hepisxaneyî ameyo girewtiş.

Baroya Edene de Serekê Komîsyonê Hepisxaneyan Avûkat Tugay Bekî babete ser o qisey kerd.

**NEQLÊ EYNÎ CA BÎYÎ**

Avûkat Bekî qiseykerdişê xo de va 'ma sebebê şewatî nêzanî' û wina domna: "3 domanê ke tedawîya înan qedîyaya, reyna erşawîyayî hepisxaneyî û nînan ra yew sewqê Hepisxaneyê Domanan yê Sîncanî bîyo. Sucê înan se beno wa bibo, ganî domanî nêameyênê tewqîfkerdiş. Çi heyf ke domanê ke şewatî ra xelisîyayî, reyna erşawîyayî hepisxane. Domanî bîyî şahidê mergê domananê bînan, no hetê psîkolojîyî de çîyêko giran o."

**NORMAL YENO DÎYAYÎŞ**

Bekî dewamê qiseykerdişê xo de va 'bitaybetî ma waşt ke ê hepisxaneyî de çi qewimîyayo, bimusî' û qiseykerdişê xo rê wina dewam kerd: "Çi heyf ke domanan tersan ver çîyêk nêva. Goreyê mi domanî hema zî binê tesîrê ters û zextî de yî. Çimkî wexto ke ma israr kerd, domanan va 'wextê kewtişê hepisxaneyî de tena 1-2 şekmatî dayî ma ro û no zî çîyêko normal o'. Ganî nê domanî bi hawayo lez serbest bêrî veradayîş. Çimkî ancax bi şert û mercê azad de merdim eşkeno hepisxane de çi amebî cuyayîş, domanan ra bimuso. Eke wina nêbo musayîşê nê çîyan mumkin nîyo."

**DO ROŞN BIKERÎ**

Bekî qiseykerdişê xo de bale ant piştîdayîşê psîkolojîk û soysalî û wina va: "Ganî piştîdayîşê sosyal û psîkolojîk bidîyo domanan, labelê nîno dayîş. Ma do sey Baroya Edene tehqîqatî taqîp bikerî. Dozger tena bi persê 'şewatî kam vet?' tehqîqatî şopneno. Ganî no hedîse ser o bi hawayo hîra cigêrayîş bêro kerdiş. Ganî sedemê ke domanan ver bi vetişê şewatî berdo, ser o bêro vindetiş. Nika destê ma de zanayîşê başî çin î. Eke kamerayê ke mîyanê hepisxane de yî, bêrî temaşekerdiş, do hedîse roşn bibo."

**GANÎ DENETÎM BIBO**

Bekî peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Ma nêzanî hedîse ver kam ameyo dûrîvistiş û ma do derheqê hedîseyî de raporêko hîra amade bikerî. Sere de Hepisxaneyê Tîpa E yê Edene û xeylê hepisxaneyî bi işkence, derb û muameleyo xirabin rojeve de yî. Seba ke vernîya nînan bêro girewtiş, ganî denetîmêko xoser bêro awankerdiş. Ganî Baroyan rê heqêko winasî bêro dayîş. Ganî astengîyê ke vernîya xoresnayîşê hepsîyan yê avûkatan bêrî wedarnayîş. Reyna wezîfedarê ke vera hepsîyan de muameleyo xirabin kar anî, bêrî cezakerdiş. Ma bawer kenî ke ancax o wext îşkenceyî cuya ma ra vejîyenî."

*EDENE - DÎHABER*

# 'Krîz ewil cinîye ser de tesîr keno'



Tirkîya de vaya Euro û Dolarî vejîyayo duştêko tewr berz û hêzê herînayîşî yê welatîyan de kêmîbîyayîşêko gird esto. Vaya xeylê çîyan de zêdebîyayîşêko muazam esto û vera ci de sînorê vêşanî xeylê hîra bîyo.

Endama Meclîsê Seba Demokrasî Yewîye (DÎB) û Parlamentera Kehene ya CHPyî Melda Onure derheqê krîzê ekonomîkî û tesîrê ci yê ser cinîyan de qisey kerde.

Onure va 'çîyo tewr giran o yo ke merdimê ke Dolar û Euroyê înan estî, bi terorîzmî yenî sucdarkerdiş' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Ez beşdarê kombîyayîşo ke qerarê 7 û 8ê hezîrane yê Turgut Ozalî girewtbî zî bîbîya. Nika kesê ke xo sey mîrasdarê Ozalî vînenî, ameyî nuqtaya ke Ozalî ra zaf apey de yî."

**OHAL BENO SEBEB**

Onure dewamê qiseykerdişê xo de va 'qanûn û raştkerdişê ke AKPyî 14 serran de kerd, bîyî sebeb ke welat de kapîtalîzm û sîstemê sermaye awan bibo' û wina va: "AKPyî nêyî bi qanûn û raştkerdişan reyde viraşt. AKP nika ra pey do huqûq zî nas nêkero. Wazenî ekonomîya ke tede sermaye hakim o derbaz bikerî. Ohal zî seba nêyî binge awan keno. Seba ke welat de ekonomîyêka baş awan nêkerdî, welat de pere nêbeno û xelqkerdiş nêvirazîyeno. Ekonomîya welatî tena ser înşaatî de yo. Înşaat zî bêkarî orte ra nêwedarneno. Verê cû no welat de tekstîl, xida, otomotîv û sewbîna zaf çîyî estbî. Nika zî rasteyê teyarayan, pirdî û merkezê herînayîş û rotişî estî. Eke şima ekonomîya xo ser nêyî de bivirazî, o wext şima nêeşkenî çîyêk xelq bikerî."

**EWIL CINÎ TESÎR BENA**

Onure peynîya qiseykerdişê xo de va 'eke ewro Amerîka dolaranê xo pîyasa ra bianca, o wext dolar xora berz beno' û wina qedênaye: "Îqtîdar hewl dano bi vatişê 'wazenî ma birijnî' na raştî biniminî. Labelê her kes raştî vîneno. Krîzê ekonomîk ewil cinîyan ser de tesîr keno û sifteyîn cinîyî bêkar manenî. Cayanê bejayîyan de cinî bi ekonomîya xo keyeyê xo lingan ser de tepişena, eke şima mudaxaleyê nê cayan bikerî, o wext ekonomîya şenike ya cinîye zî orte ra wedarîyena."

*STENBOL - ŞÛJIN*

## Dewlete bi 30 hezar TLyî viraşte, rote 70 hezar TLyî

Wan de serra 2011 de bi şîddetê 7,5 û 5,6 de 2 zelzeleyî virazîyayî. Her çiqas ke zelzele ser ro hende wext vîyarto zî birînê waniijan nêameyî girewtiş. Şarê Wanî zelzele de zaf çîyî xo vînî kerdî. Mexdurê ke keyeyê xo berdî awanîyê Îdareyê Awanîyê Komkî (TOKÎ) bi afateko bîn reyde rî bi rî mendî.

Dewlete bin nameyê 'şîyayeyo hempar' de welatîyan ra pere wazena. Zelzele ser ro 7 serrî vîyartî, la mexdurî nêeşkenî heqê awanîyan bidî. Dewlete bin nameyê hetkarîye de awanîyan viraşte de dima ra mexduran ra pereyêko zaf waşte. Mexdurî seba ke deyndar nêbî keyeyê xo roşenî.

**HETKARÎ NÊDANA**

Welatîyê ke zelzele ra dima TOKÎyê dewlete de bîyî mexdur, qisey kerdî û zehmetîyê ke ewja de ancenî, ardî ziwan: "Pereyê ke yeno waştiş nîmeyê meaşê asgarî yo û ganî ma her aşmî pere bidî. Labelê îmkanê ma çin o. Xora dewlete zî wazena ke ma pere nêdî û dima ra aye dest rona keyayan ser de. Viraştişê awanîyê TOKÎ de 30 hezar TL pereyê dewlete şîyo. Labelê bi 70 hezar TLyî rotî mexduran. Zelzele de merdimê ma, keyeyê ma, ganê ma û sewbîna her çîyê ma destê ma ra şîyî. Ser de zî dewlete dana ma ro. Ma nêeşkenî fatureyanê xo daxî bidî."

*WAN - ŞÛJIN*

# Ganî ma pîya bibî



Hêzê Şorişgerî yê Ciwanan (GDG), Federasyonê Komeleyê Ciwananê Sosyalîstan (SGDF), Rayîrê Şorişger de Ciwanê Şorişgerî, Tevgerê Wendekarê Sosyalîstî (SOH), Ciwanê Demokratê Neweyî (YDG) û Endamê Xover bide Unîversîte bi siloganê 'Vera Serekî de ciwanî estî' bi hawayo hêz kampanaya 'nê'yî meşnenî.

Babete ser o Hemsereka SGDFyî Ceren Çobane qisey kerde.

Çobane va 'Serekkomar Erdogan hewl dano rejîmê qesre newe ra awan bikero' û wina domnaye: "Wexto ke merdim prosesî ra ewnîyeno, ma vînenî ke ma mîyanê kaosêk de yî. Ciwanê unîversîteyî zî mîyanê nê kaosî de tesîr benî. Tena ciwanê unîversîteyî zî nê heme ciwanî nê prosesî ra tesîr benî."

Çobane dewamê qiseykerdişê xo de wina va: "Ma bi hawayo aşkere nê sîstemî ra vanî nê. Ciwanan ruhê Gezî xo vîra nêkerdo û seba perskerdişê hesabê Berkîn Elvan û Qirkerdişê Pirsûsî ganî ma cepheyê 'nê'yî rêxistine bikerî. Ganî ma vera terso ke qesre wazena awan bikera de pîya hereket bikerî. Ma sere de cinî û ciwanî dima ra veng danî her kesî, wa mîyanê nê kampanya de ca bigirî."

*STENBOL - ŞÛJIN*

## Nêweşîyê cîldî zimistanî zêde benî

Cildê merdiman heme tewir tehlukeyanê teberî rê akerde yo, cok ra bi hawayo lez çîyan ra tesîr beno. Grûba nêweşîyê cîldî grûbêka hîra ya. Derman û werdê ke ma wenî, laşê ma de beno sebebê problemanê metabolîk û nê zî xo cildê merdimî de danî teber.

Babete ser o Pisporê Dermatolojîyî Dr. Zafer Şentute qisey kerde û derheqê nêweşîyê cîldî de zanayîşî daye.



**XO DANÎ TEBER**

Şentute dîyar kerde ke nêweşîyê ke xo cîld, por û nenûg de danî teber kewenî grûba nêweşîyê cîldî û wina va: "Nêweşîyê zereyî, kêmîbîyayîşê gonî û şekerî zî xo cîldê merdimî de danî teber. Wexto ke hewa lîşin û serd bibo û tîje kêmî biba, ewja de problemê nêweşîyan hîna zêde benî. Nêweşî zimistanî zêde benî. Nêweşîyê nezilî, egzama, rişîyayîşê porî, xirabîyîşê şeklê nenûgî, nêweşîyê genetîkî û nêweşîyê sedefî zî cîldê merdimî de xo danî teber. Heta ke ma laşê nêweşî ra nimûneyêk nêgirî ma nêeşkenî teşhîsêko raşt bikerî."

*MÊRSÎN - ŞÛJIN*

www.arsivakurdi.org

ROJEVA
Medya
28 Çile Şemî 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
Yenişehir-DİYARBAKIR

Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı (ÇAP):
İstanbul: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık
Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. No:13/A Yüreğir / ADANA
Tel:0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail:
rojevamedya@hotmail.com







Bexçeyên Hewselê yên ku demeke dirêj e ji bo rantê di hedefa AKP'ê de ne, bi biryarnameya di hikmê qanûnê de hatin destserkirin


# Warê teyr û tûran ji bo rantê tê talankirin


MELEK YUKSEL / AMED - ANF


Bexçeyên Hewselê yên ku ji sala 2015'an û vir ve di Lîsteya Mîrateya Çandî ya Cîhanê ya UNESCO'yê de ne, ji aliyê Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê ve di 28'ê kanûna 2016'an de bi biryarnameya di hikmê qanûnê de wek 'Herêma Projeya Taybet' hat ragihandin. Li gel ku divê proje ji raya giştî re bê ragihandin jî heta niha der barê projeyê de ji aliyê rayedaran ve daxuyaniyek nehatiye dayîn.


Bexçeyên Hewselê yên ku wek 'embara zad' a Amedê tên nasîn û şopên şaristaniyên wekî Hîtît, Hûrrî-Mîtanî, Asûr, Aramî, Ûrartû, Îskît, Med, Pers, Makedonya, Part, Ermenî, Roma, Sasanî, Bîzans, Emewî, Ebbasî, Şeyhogûllari, Hamdanî, Merwanî, Selçûkî, Înalogûllari, Nîsanogûllari, Artûklû, Eyyûbî, Akkoyûnlû, Sefewî û Osmanî lê hene, bi destê AKP'ê tê talankirin.


Bexçeyên Hewselê yên ku bi destê AKP'ê ji bo rantê tên talankirin tê payîn ku li şûna çandina daran mizgeft û qaşo 'cihên balkêş' lê bên avakirin. Heke qada ji 14 hektarî ya 'Projeya parastina îmara nava Sûrê' ya ji 32 hektarî di Rapora Etudên Jeolojîk de wek herêma qedexe hatiye îlankirin jî, ev rapor weke 'dikare avahî lê bên çêkirin' ji aliyê wezaretê ve hatiye guhertin.























Bexçeyên Hewselê yên ku bi bedewî û bereketa xwe mîna efsaneyeke navdar in, tê gotin ku navê xwe ji Hoserê girtiye. 'Hoser' tê wateya cihê ku gelek dar lê hene. Li gorî rîwayetekê Mihemmed pêxember dema diçe Mîracê, cihekî tijî dar dibîne û dibêje 'dibe ku bihûşt ev der be'. Li gorî rîwayeteke din jî gotina 'Hewsel'ê ji peyva 'esfel' (cihê çûkan) tê. Çil hezar kesên li Nisêbînê ji ber hêzên îranî reviyane û xwestiye bikevin nav bajarê Amedê, destûr ji wan re nayê dayîn bikevin nava bajêr û neçar dimînin ku li Hewselê bi cih bibin û di nav demê de dest bi çandiniyê dikin û baxçeyên Hewselê diafirînin.

Li van bexçeyên ku li ser rêya çûkên koçber e, zêdetirî 180 celebên çûkan dijîn. Her wiha segav, jûjî, kûje, roviyê sor, berazê beyar, sihorî, marmarok, mar, beq û beqên Firatê (Rafetus Euphraticus) ku li ser tevahiya cîhanê tenê li çemên Firat û Dîcleyê dijîn, gelek heywan hene.

## JI BO HEWSELÊ

Pêvajoyeke bi heman rengî di Adara sala 2014'an de jî rû da û Baxçeyên Hewselê ji aliyê Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê ve wek 'cihê rezerva avahiyan' hatibû îlankirin. Lê belê gelê Amedê bi taybetî jî ciwan xwedî li vê dîroka 8 hezar salî derketin û lê kon vedan û ji bo Baxçeyên Hewselê li ber xwe da. Ne tenê ji Amedê, ji tevahiya Kurdistan û Tirkiyeyê bi sedan mirovan li vê derê nobeda ekolojî û dîrokê girt.

Di encamê vê berxwedanê de wê demê de Baxçeyên Hewselê hatin rizgarkirin. Lê belê piştî du salan, piştî hewldana darbeyê ya 15'ê Tîrmehê ku Rewşa Awarte hate ragihandin, projeyên talankirina Baxçeyên Hewselê careke din xistin rojevê. Heke ev proje bi cih bê dê bi sedan sewal ji qada xwe ya xwezayî bên derxistin û li şûna wan blokên ji beton bên çêkirin.

# Çandiniya Bakurê Sûriyeyê bi pêş dixe



BÊRÎTAN SARYA / HESEKÊ - ANF

Di dema rejîma Baasê de li Rojavayê Kurdistanê çandina fêkî, sebze û daran hatibû qedexekirin. Destûr dihat dayîn ku tenê genim, ceh û kuncî bên çandin. Sebze û fêkiyên ku pêwîstiya gel pê hebû, ji bajarên navendî yên mîna Heleb û Şamê dihatin. Rejîma Baasê ji aliyekî ve genimê li Rojava dihat hilberîn ji xwe re dibir û dikir nan, li aliyê din jî madeyên din ên xwarinê li bajarên din ên Sûriyeyê hildiberandin û bi vî rengî gelên li Rojava bi taybetî kurd bi xwe ve girê didan.

Karê aboriyê yê piştî Şoreşa Rojava dest pê kir, ev polîtîkayên rejîmê ji holê rakirin û armanca 'têra xwe kirin'ê danî pêşiya xwe. Di nava polîtîkaya aboriya civakî ya meclis û komîteya aboriyê ya TEV-DEM'ê de çandinî xwedî cihekî girîng e. Di Konferansa Aboriyê ya TEV-DEM'ê de, ku di sala 2016'an de hate lidarxistin, plansaziyek ji bo aboriya 5 salan hate derxistin.

Di nava vê de pêşvebirina çandiniya ekolojîk de esasgirtina cihêrengiya çandiniyê û amadekirina nexşerêya çandiniyê wek karên sereke cih girt. Di vê çarçoveyê de ji bo pêşxistina çandiniya Rojava, Laboratuvara Navenda Lêkolînên Çandiniya Zanistî ya Hesekê hat vekirin. Navenda ku li ser av û axa Rojava analîzan dike, xebatên xwe yên ji bo xurtkirina çandiniya ekolojîk û zanistî bê navber didomîne.

## 'AXA ME KÊRHATÎ YE'

Berpirsyara Laboratuvara Navenda Lêkolînê ya Çandiniya Zanistî ya Hesekê Sosin Hesekê der barê xebatên laboratuvarê de axivî û diyar kir ku wan bi perwerdeyê dest bi xebatên xwe yên li ser çandiniyê kiriye û wiha got: "Di destpêka perwerdeyê de em li ser mêjiyê çandinî û aboriyê yê rejîmê û Şoreşa Rojava sekinîn. Piştî perwerdeyê me berê xwe da pratîkê û hezar mînak ji axa bajarên cuda girtin û anîn laboratuvarê."

Hesekê da zanîn ku ji bo ku cotkar bikarin çandiniyeke rast bikin, agahiyên xwe bi wan re parve dikin û wiha pê de çû: "Cotkar me guhdarî dikin û li gorî agahiyên ku em bi wan re parve dikin tev digerin. Ji ber vê yekê zanebûna cotkaran li gorî demên berê zêde bûye û cotkar ji bo tehlîlên xwe yên av û axê serî li laboratuvara me didin."

Hesekê diyar kir ku armanca wan a sereke afirandina nexşeya çandiniyê ye û wiha got: "Derxistina nexşeya çandiniyê dike bi dawî bibe. Ji ber ku di dema rejîmê de tenê çandiniya çend berheman dihat kirin, axa me qels bûbû. Bi çandiniya çend salên dawîn re em dibînin ku ji bo çandiniyê axa me kêrhatîtir dibe."

